

Çiyayê Sasonê

Ev cihê ko bi çiyayê Sasonê bi nav dibe, ji bîst û sê çiyayên mezin û biçûk biheketî ye. Çiyayên han her yek xweyî nav û bi geliyên kûr ji hev cida ne. Di nîveka van çiyayan da, bi navên Karmilêh, Karnêk û Arzîv sê çiya hene ku bi bilindî û rêdij-wariyên xwe hatine nasîn. Navbera van her sê çiyayan bi çemên Artirêrê û kuskêt ji hev diqetin.

Rûpel 7

SIYASET

Biyanuwî parastinî sinur û helwestî siyasîyekanî kurd

Em ro hemwan baş dezanîn ke meseleke biyanû we û hîçî tir. Dena xo meseley xwastinî Musil û Kerkukîş, her le zuwe we, meseley parastinî sinur niye. Xo hêrîş û pîlanekani Turkiyê dijî şorişekani Başur ber li serheldanî şorişî Bakurîş parastinî sinur nebû.

Rûpel 10

RAMAN

Alewiye ser

Esker ki 1980 di hukmat guret xo dest, sosyalistî tirkan tayê xo est ver tayew rew axeme bî. Xoveredayîna xo hen zef çip nêbî. Çi hêf partiyî nînan rew axeme bî. Onca o çax xeylê şehîd day. Zirara naye ki en jedi rest Alewiyî kurd. Çi ki sosyalist ki axme bî, verin zilma dewlete di teyna mendî Dêrsîm û dorme xo o waxt xeylê goç da. Ebi zafey xortê xo axme bî.


Rûpel 11

ŞANO

Awireke dîrokî li ser şanoyê

Tiyatro, gotineke grêkiye ku tê wateya listikgehê. Di bingeha xwe de ji peyva "theatron" tê. Kurdiya vê peyvê şanogeh ango nîgargeh e. Heger mirov bi çavekî dîrokî lê mêze bike, hingê navê Grêka kevin tête ser zimanê mirov. Şano bingeha xwe ji olperesiyê digire. Ew li ser stran, govend û kevneşopiyê ava bûye.

Rûpel 13



Dr. Kemal Mîrawdêlî der barê çand û siyasetê de pirsên me bersivandin:

## Dijmin me yek dibîne çima em bi xwe nebin yek

▼ Me divêt wekî netewe bi jîn bin, mesele ne cûdaxwazî û tiştên din e, em ne li dijî tirk, ereb û ecem in. Lê belê ew jî ziyane dikin, ne bi tenê kurd. Li Tirkiyeyê binêrin bê di çî rewşê de dijî. Tunebûna azadiyê, helweşîna aboriyê, tunebûna asayîşê û hwd. Tirkiye bi vê rewşê nabe Ewrûpayî.

▼ "Dema ku min pirtûka Felsefey Ciwanî û Huner nivîsand, ji bo zanista siyasetê destpêkek bû. Em hemû siyasetê dikin, lê pirtûkeke me ku qala siyasetê bike tune ye. Der heqê siyasetê de baştirîn pirtûk ji aliyê Arîsto ve hatiye nivîsandin, lê kurdiya wê tune ye."

Rûpel 8-9

## Li Başûr pêngaveke nû: Hilpişkîna birûskî



▼ Li Başûr bi êrîşa Tugaya Birûskî ya ARGK'ê pêngaveke nû dest pê kir. Derdorên siyasî dipejirînin ku PDK demêke dirêj nikare li hemberî PKK'ê li ber xwe bide, lewre jî KT hêzên xwe li ser sînor dicivîne û Amerîka ji bo ku peymanê aştiyê pêk were, ketiye keftelefteke gur.

▼ Serokê Giştî yê PKK'ê A. Öcalan diyar kir ku divê PDK'ê dev ji politikaya xwe ya îxanetê berde, bi dijminê gelê kurd ê esasî re hevkarîyê neke. Öcalan armanca hilpişkîna birûskî jî wekî pêkanîna federasyona demokratîk diyar kir. Rûpel 2



# Li Başûr pêngaveke nû: Hilpişkîna birûskî

**Li Başûrê Kurdistanê bi êrişê Tugaya Birûskî ya ARGK'ê pêngaveke nû dest pê kir. Tugaya ku bi van livbaziyan damezrîna xwe diyar kir, di demeke kurt de gelek meqereyên PDK'ê bi dest xistin. Rojnameyên tirk jî di nav de derdorên siyasî dipejirînin ku PDK demeke dirêj nikare li hemberî PKK'ê li ber xwe bide, lewre jî dewleta tirk hêzên xwe li ser sînor dicivîne û Amerîka jî bo ku peymanê aştiyê pêk were, ketiyê keftelefteke gur.**

Li başûrê Kurdistanê bi hilpişkîna birûskî la ARGK'ê qonaxeke nû dest pê kir. Li ser vê bûyerê, derdorên siyasî nixandînen cur bi cur kirin. Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kur-

distanê Adullah Öcalan, roja 28'ê gelawêjê di televîzyona Medê de, da zanîn ku hêzên ARGK'ê ev êriş jî bo pêkanîna federasyoneke demokratîk li dar xistine û wiha peyivî: "Divê PDK dev ji politikaya xwe ya îxanetê berde." Li gorî gotina Öcalan, hêzên împeryalist û kolonyalist li Dublînê biryara jiholêrakirina destkeftiyên gelê Başûr dane û ji bo vê yekê jî PDK ji xwe re kirine hallet. Serokê PKK'ê ev livbaziya xwe ya li Başûr şibande hilpişkîna 15'ê gelawêjê û diyar kir ku ewê parêziya destkeftiyên gelê Başûr bikin. Öcalan da zanîn ku kes nikare ji wan re bibêje "Çi kare we heye li vir", ji ber ku ew tevgerê Kurdistanî ne, û heke faşîstên tirk, împeryalist li Başûr jî xwe re cih dibînin, divê cih jî tevgerê Kurdistanî re jî hebe. Her wiha Öcalan jî vê yekê re jî mîna keke dîrokî da: "Ma em karin bibêjin Mele Mustafa li



Gelê Başûr guh nade banga PDKê ya ji bo seferberiyê

Mehabadê çi dikir, çima xwe têkilî karê hundirîn ê kurdên Îranê dikir? Na! ji ber ku wî wezîfeya xwe ya welatparêziyê kiriye, lewre jî çûye bûye Wezîrê Parêziyê yê Komara Mehabadê."

Serokê Giştî yê PKK'ê xwest ku Mesûd Berzanî jî bavê xwe dersê bistîne. Dîsa wî bi gelek mîna-kan diyar kir ku PDK'ê bi xwe jî mudexaleyî karê kurdên Bakur kiriye. Serokê PKK'ê diyar

kir ku ew naxwazin wî şerê zêde bidomînin, lê ewê tu caran destûrê nedin politikayên îxanetê û heke PDK were ser riyarast, ewê heta dawiyê alîkariya wan jî bikin. Wî got ku, ew dixwazin artêşa tirk êrişî ser Başûr bike, da ku ew wê derê jê re bikin doje.

Piştî bûyerê, Berpirsê ERNK'ê yê Ewropayê Ali Sapan jî daxuyaniyek da çapemeniyê. Li gorî ragihandina ajansa

DEM'ê ya 29'ê mehê, Sapan daxwaz kiriye ku PKK li Başûr wekî hêza sêyemîn bê pejirandin.

Ji aliyê din ve, banga Serokê PKK'ê ya ji bo federasyoneke demokratîk, di nav hêzên herêmê de bû sedema gengeşiyên û Yekitiya Neteweyî ya Demokratîk ku ji gelek rêxistinên başûrî pêk tê, piştigirîya xwe ji bo vê bangê diyar kir.

Li hêla din PDK, Tirkiye û Amerîkayê ev

tevgera ARGK'ê wekî hewledanên têkbirina "Lihevkirina Dublînê" bi nav kirin û giranî dan ser meşandina xeta vê lihevkerinê. Lê tevî vê yekê PDK'ê îdia kir ku YNK'ê alîkariya hêzên PKK'ê kiriye û li dewsa ku bi hêzên ARGK'ê re têkevin şer, êriş birin ser hinek mewziyên YNK'ê. Dîsa piraniya rojnameyên tirk, bi berfirehî cih dan bûyerê û da zanîn ku hêzên PDK'ê nikarin li hemberî ARGK'ê li ber xwe bidin. Wekî mînak rojnameya Yeni Yüzyıl û Turkish Daily Newsê di nûçeyên xwe de diyar kirin ku, PKK di dema şerê PDK û YNK'ê de xurt bûye û gelê Başûr guhê xwe nedaye banga PDK'ê ya ji bo seferberiya leşkerî.

Ji nixandînan derdikeve holê ku êdî hêzên Başûrî nikarin li gorî qeydeyên berê bimeshî û divê li gorî hevkeşeya hêzan a nû hereket bikin.

SAMÎ BERBANG

## Kedkarê jiyaneke birûmet

Ro li Kurdistanê şerê qirêj û gemar heye. Gelê kurd li hemberî vî şerî bi can û malê xwe têkoşîna xwe didomîne. Têkoşîna gel, ji bo jiyaneke serbixwe, birûmet û wekhev e. Dijmin bi tank, top û balafirên xwe ve bi ser gel de diçe. Lê, bipêşveçûna gel nikare bide rawestandî. Yek bi yek ji nav gel însanan digire û dikeve, dîsa jî meşa gel, bipêşveçûna gel nikare bisekinîne û gel bêhtir bi pêş ve diçe.

Kesên ku qirêjî û gemariya şer derdixin holê

jî hedefa dijmin in. Piraniya van kesan jî rojnamevan in. Ji sala 1992'an û bi vir ve 25 rojnamevan jî aliyê dijmin ve hatin kuştin. Yek ji van kesan jî rojnamevanê rojnameya Yeni Politikayê Sayfettin Tepe ye. Tepe, di sala 1994'an de li rojnameya Özgür Gündemê dest bi rojnamevaniyê kir. Dema ku dest bi xebatê kir wiha digot: "Ez dizanim wê rojê dor were ser min jî. Lê ez dev ji xebata xwe bernadim."

Tepe piştî ku Özgür


Gündem hate girtin, îcar di rojnameya Özgür Ülkeyê de dest bi xebatê kir. Demekê li Stenbolê vî karê xwe meşand. Ji Stenbolê jî çû Bûroya Özgür Ülke ya Dilûkê (Entebê), pir dom nekir, piştî re çû Agiriyê. Piştî çûyîna Agiriyê bi pênc rojan polîsan ew girtin binçav. Polîsan di binçav de gelek îşkence lê kiribûn. Piştî ku ji binçav derket, hate Stenbolê. Çend rojan li IHV'ê (Waqfa Mafên Mirovan) tedawî bû. Di pey tedawiyê de jî çû li Buroya E-

deneyê xebitî. Rojnameya Özgür Ülke ji aliyê dewletê ve hate girtin, lê wî dev ji xebata xwe berneda.

Dema ku rojnameya Yeni Politikayê dest bi weşana xwe kir, Tepe jî di vîr de xebata xwe berdewam kir. Demekê kurt li Buroya Dilûkê (Antep) xebitî. Ji vîr jî çû Buroya Batmanê. Dema ku çû Batmanê wiha digot: "Ez diçim nevenda kontrayan. Lê ezê li ber xwe bidim. Ez dizanim ku ez hedefa dijmin im. Tim li min digerin. Li Bilîsê kî tê girtin, pirsê min jê dîkin. Ez texmîn dikim wê tiştê nebe. Lê dîsa jî belî nabe"

Tepe ji roja ku dest bi xebata rojnamevaniyê kir û heta roja ku hate kuştin, pesta dewletê li ser hebû. Carinan bi telefonê, carinan jî rasterast tehdît dikirin. Lê wî digot: "Heta karibim ezê bimeshîm"

Meşê heta 29'ê gelawêjê domand. Roja 22'yê gelawêjê polîsan avêtin ser Buroya Êlihê. Sayfettin, Ramazan û



Sayfettin Tepe (1968- ...)

Aydın girtin binçav. Ramazan û Aydın piştî çend seatan berdan. Ramazan, her roj jê re xwarin dibir emeniyetê. Piştî çar rojan Sayfettin birin Emniyeta Bilîsê. Li vîr jî malbata wî xwarin jê re dibir û ew didîtin. Roja 29'ê gelawêjê seat di 20.00'an de polîs hatin mala birayê wî û gotin ku Sayfettin xwe xeniqandiye.

Sayfettin di binçav de jî meşa xwe berdewam kiribû. Dijmin nikarbû wî ji vê meşê qut bike. Ji

bo vê yekê jî ew kuştin. Sayfettin di xebata rojnamevaniya kurdî de şehîdê 25'an e. Qatîlê Sayfettin êşkere ye. Her mirov dizane ku dewletê Sayfettin kuşt, lê xebata rojnamevaniya birûmet dîsa dimeşe. Xebata Sayfettin, ji bo jiyaneke birûmet bû. Ew heta dawiyê bi vê dozê ve girêdayî ma.

Em jî li ser rêça wî ne û emê heta dawiyê jî di vê riyarast û durîst de bimeshî.

HAYRETTİN ÇELİK

## Li Dêrsimê ambargoyeke nû

Hêzên dewletê li Dêrsimê bi hhatina zivistanê îcar gemaro (ambargo) danîn ser ardû. Li gorî nûçeyê ajansa DEM'ê, hêzên dewletê li gund û navçeyên Dêrsimê destûrê nadin gel ku êzingan bibin navçeyan bifiroşin. Tê gotin ku ev kirin, bi tûnbûna sermayê rewşa gel diwartir dike. Li gorî agahiyên ku ajans dide, Kaymakamê Pertekê Şevket Cinbir, muxtarên gundan li

Komandariya Cendirmeyan civandine û bi wan daye zanîn ku ji gundan anîna êzingan qedexe ye. Gundî dibêjin ku, hêzên dewletê li ser riyar navçeyê kontrolê dikin û dest datînin ser êzingên wan. Ev kirin bandorê li navçeyên Xozat, Pîlûrê jî dike. Ji ber ku ketin û derketina navenda Dêrsimê qedexe ye, gemaro li ser navenda bajêr jî berê ve heye.

Navenda Nûçeyan



NA!...  
TEKILIYEME PÊ  
NINE...  
EW BIXWE ÎNTIHAR  
KIRIYE...



### Li Stenbolê bombe teqiyân

Roja 27'ê gelawêjê li gelek deverên Stenbolê bombe teqiyân. Bombeya ku li ser cadeya îstiklalê ya Beyoğlu teqiya, bû sedema mirina Cigirê Serokê Ûlkü Ocaklari ya Beyoğlu Ferhat Kaya û jineke Urdîni, dîsa li Laleli û DSP'ya Beykozê jî bombe teqiyân. Timên Metrepolan ên ARGK'ê ev kar hilgirtin ser xwe.

### Dewletê pirtûka li ser DEP'ê jî qedexe kir

Pirtûka ku bi navê "DEP Depremi" di nav weşanên Weşanxaneya Doruk de derketibû, ji aliyê DGM'ya Enqreyê ve hate berhevkerin. Pirtûk li ser qedexebûna Partiya Demokrasiyê (DEP) û girtina mebûsên wê di-sekine. Rayedarê Weşanxaneya Dorukê Niyazi Koçak kirina DGM'ê rexne kir, da zanîn ku pirtûk bi awayekî objektîf pêvajoyê dinirxîne û piştgiya aştiyê dike.

### Boyner xwest li Amedê bibe tûrist

Serokê Partiya Tevgera Demokrasiya Nû (YDH) Cem Boyner roja 29'ê gelawêjê bêyî ku rayedarên dewletê agahdar bike, çû Amedê. Boyner alîgirên partiya xwe yên ku çûbûn pergîniya wî, ji hev belav kirin û got: "Min divê ez li kolanên Amedê bi rihefî bigerim, bi gel re sohbetê bikim. Ez dixwazim îcar wekî tûristekî bim." Lê ne hêzên dewletê, ne jî alîgirên YDH'ê rê nedan vê yekê.

### Sê dijberên şer hatin cezakirin

Sê çalakdarên Komeleya Dijberên Şer roja 29'ê gelawêjê li dadgeha leşkerî hatin cezakirin. Li gorî îdiaya mehkemeyê, van kesan dilê mirovan ji leşkeriyê sar kiriyê. Her çiqas çalakdarên dan zanûn ku darizandinan wan li mehkemeya leşkerî ne tişkekî hiqûqî ye jî mehkemeyê Arif Hikmet İyidoğan bi 6 mehan, O. Murat Ülke bi 3 mehan û M. Sefa Fersal bi 2 mehan ceza kir.

### RTÜK 720 radyoyan digire

Lijneya Bilind a Radyo û Televizyonê (RTÜK), da zanîn ku ewê 720 radyoyên ku ji bo destûrnameyê serî li waş nedane, qedexe bikin. Serokê RTÜK'ê Ali Beransel îdia dike ku tevî qedexeyê jî ewê pir-dengiya weşanên radyoyan biparêzin, lê heta niha gelek radyoyên dijber hatin îkazkirin û cezayên cur bi cur xwarine.

## 'Divê em aştiyê li ser vê coxrafyayê pêk bînin'

Îsal di Roja Aştiyê de saziyên aştiwxaz gelek çalakîyan pêk tînin, ji niha ve hinek rêxistinên wekî, HADEP, BSP, SİP, DDP, İHD û Platforma Demokrasiyê amadekariya vê rojê dikin. Her wiha roja 2'ê rezberê BSP û Amadekariya Partiya Çepgir a Girseyî, roja 3'ê mehê jî HADEP'a Kadiköyê şevan li dar dixin.



Zarokên kurd mafên xwe û aştiyeke birûmet dixwazin.

Roja 1'ê rezberê li Edeneyê İHD û Platforma Demokrasiyê ji bo aştiyê şahiyekê li dar dixê. Şahî li Tesîsên Lunaparkê yên Edeneyê bi beşdariya gelek hunermendan pêk tê. Roja 2'yê rezberê li Mersînê, Platforma Partiyên paneleke ku serokên BSP, SİP û HADEP'ê beşdar bibin, pêk tîne. Dîsa roja 3'yê rezberê li Mersînê mitinga aştiyê çêdibe. Tê hêvîkirin ku nêzî 30-40 kes beşdarî mitingê bibin. Dîsa wê Platforma Partiyên (BSP, SİP, HADEP, DDP) Amadekariya Partiya Çepgir a Girseyî li Edeneyê bi beşdariya A. Melik Fırat, Akin Birdal, Murat Salmaner, Yılmaz Çamlıbel, Hayri Kozanoğlu û Mustafa Çinkılıç panelekê çêbike. 1'ê Rezberê wê li İzmirê jî bi çalakîyên wekî panel û konferansan bê pîrozkin.

Komeleya Mafên Mirovan (İHD) jî li ser 1'ê Rezberê (roja aştiyê) roja 26'ê gelawêjê daxuyaniyek da çapemeniyê. Daxuyanî li ser maneya rojê di-sekine û dide zanîna ku wê di 1'ê Rezberê de dengê aşti, wekhevî û biratiya gelan bilind bike. Daxuyanî balê dikişîne ser rewşa Balkan û Rojhilata Navîn. Tê gotin ku li ser vê xaka ku ew lê dijîn şerekî ku nav lê nehatiye kirin, didome û tesîrê li her kesî dike. Di daxuyanîyê de tê gotin ku êdî malbatên leşkeran, heta hinek leşkerên ku dewletê ew şandine mirinê jî rûyê şerê kirêt dîtine û fêhm kirine ku ev politikaya dewletê nameşe. Daxuyanî bangî hemû kesên mirovperwer dike ku ji bo rawestîna şer û pêkhatina çareseriyê demokratîk û însanî, rabin ser piyan.

Di dawiyê daxuyanîyê de çalakîyên ku wê İHD jî bo pêkhatina aştiyê bike, tên rêzkirin. \*Wê roja 1'ê rezberê di navbera 11 û 13'an de nûnerên saziyên ku piştgiya aştiyê dikin, li Meydana Sultanahmedê rûnin. \*Ji 1'ê rezberê û pê ve wê Bultena Aştiyê bê belavkirin. \*Piştî 1'ê rezberê wê du mehan kampanyaya îmzayan bê vekirin, pişt re ew îmze wê pêşkêşî meclîsa tirk bibin. \*Ji bo 1'ê Rezberê afîş û tişort wê bînin amadekirin. \*Roja 14'ê kewçerê wê li navenda İHD'ê rayedarên komelê ji bo aştiyê rojekê greva birçîbûnê pêk bînin. \*Di 23'yê kewçerê de wê di navbera Stenbola û Mircê de Sefera aştiyê ya trenê çêbe. \*Piştî 7'ê rezberê wê ji sendikayan bê xwestin ku ji bo aştiyê rojekê kar bisekin.

Di dawiyê meha sermayezê de ji bo aştiyê komcivînekê tê çêkirin, pişt re jî Pirtûka Aştiyê tê weşandin.

Her wiha wê İHD tevî saziyên aştiwxaz heyetan ava bike, hevdiştinan bi nûnerên partî, sendika û saziyên demokrat re pêk bîne. Dîsa li ser aştiyê panel tên lidarxistin. İHD wê hewl bide ku dengê çalakîyên xwe bigihîne derveyî Tirkiyeyê jî.

Welatê Me Stenbol-Edene-İzmir

### DIK

### 1'ê Rezberê çiqas aşti anî?

Di sala 1945'an de Şerê Duyemîn roja 1'ê rezberê bi serkeftina dewletên hevalbend xelas bû. Bi despêkirina şer hinek mêtîngehên Almanya, İtalya, Fransa û İngiltereyê derfeta rizgariyê bi dest xistin û li Rojhilata Navîn cihûyan bi navê İsrail, dewleteke nû ava kirin. Almanya bû du parçe, parçeyek di bin bandora Sovyetê de ma, parçeyê din jî ket bin bandora Amerîkayê.

Bi xelasbûna şer wisa hate zanîn ku, dewletên ku bûbûn sedemên şer wê ji bo aştiyê heta-hetayî xebatê bikin. Feqet piştî wê li rûyê dinyayê du heb blok ava bûn; NATO û Varşova. Pişt re jî Şerê Sar dest pê kir. Heta hilweşîna Yekitiya Sovyetê vî şerê dewam kir. Bi çekên kimyewî qetlîam çêbûn, bi bermayiyên çekên nukleer hevkeşeya siruştê serûbin dibe.

Niha li seranserê dinyayê şer hene, ew şer li gorî teoriya împeryalistan a nû (Low Intensive War), bi tundiyêke nizim dimeşe. Pêkanîna aştiyê li ser rûyê erdê hîn jî wekî peywireke sereke li pêşîya mirovahiyê sekinîye.

METİN AKSOY



# Mehmet Emin Şen: Ka biratiya ku dibêjin?



Hêzên dewletê dema gundê Kermêtê şewitandin nehiştin gundî tiştêkî ji mala xwe derxin.

Ji bo çi ev bûyer qewimîn. Ji bo ku em birayên hev bûn, ji bo ku gawir nekevin nav me, ji bo ku namûsa xwe me ev kir. Wêca îro jî me ew (gawir) ji nav xwe derxistin. Ew (tirk) tên gundê me dişewitînin, em jî gundên me derxistin.

Mehmet Emin Şen di sala 1914'an de li navçeya Mêrdînê Mehsertê gundê Kermêtê hatiye dinê, ji her du piyên xwe seqet e. Di roja 15'mîn a greva birçîbûnê de nûnerê me yê Edeneyê pê re hevpeyvînek kir. Wî kalê 75 salî serpêhatiyên xwe diyarî xwendevanên Welatê Me kir.

"Bavê min û apê min hebûn. Kalikê min çûbû rehetê, 2 heb metikên

min û pîrika min hebû. Bavê min û apê min çûne seferberlikê. Emrê bavê min 25 salî, apê min jî 14 salî bû. Pêncî heb jî gundê me çûn seferberlikê, hinekan 10 salan, hinek 15 salan, hinek 7 salan seferberî kirin û hatin, lê belê apê min jî di nav de 28 kes nehatin. Yek ji wan ku wî nas dikin bi navê Mahmudê Xelê li Hindistanê çû rehetê. Yek jî li Erzeromê bi navê Mehmudê Elî şehîd ket.

Ji bo çi ev bûyer qewimîn. Ji bo ku em birayên hev bûn, ji bo ku gawir nekevin nav me, jî bo ku namûsa xwe me ev kir. Wêca îro jî me ew (gawir) ji nav xwe derxistin. Ew (tirk) tên gundên me dişewitînin, em jî gund derxistin. Par di sala 1994'an de jî gundê Kermêtê kesekî 80 salî bi navê Selim Öz-

demir (Selimê Pero) kuştin, ji bo ku li mintiqeya Migrê lêhev xistin derketibû û gelek leşker hatibûn kuştin. Leşkeran hatin ew kuştin di sala 1994'an de di payizê de li cem zarok û pireka wî û kurmamê wî Zekî Özdemir.

Îsal beriya sê mehan muxtarê gundê Kermêtê hate revandin. Piştî 13 rojan termê wî dibînin. Piştî 2 mehan di navbera cerdevanên Rêsinê Miqrê, Tinatê û Gerîla de şer derdikeve. Li wir jî cerdevanan yek tê kuştin, ji ber vê yekê hatin 2 zarok; yek 11 salî, yek jî 13 salî ji pişt kalikê wan deranîn û kuştin. Pişt re jî agir berdan mala wan. Ji gund hetanî Hecî Bro jî

li cem zarokên wî datînin û nêzikî 100 guleyî berêdidin û dikujin. Ez dixwazim bipirsim; madem em birayên ne û li Koryê, Çanakkale, Qibris û gelek deweran me bi sedan qurban dan, çima ev tene serê me?"

SALIHÊ KEVIBIRÎ

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 40'î de peyva veşarî 'PÎREJIN' dîtine û kaseta Koma Azad "ŞEMAL" qezenc kirine:

Muhammed Şakar Amed

Serpil Şahin Bayraklı/Izmir

Î. Omerî Qoser/Mêrdîn

Remzi Kalhanlı Ruha

Gülnaz Aymaz Kayseri

## XAÇEPIRSA BIXELAT (40)


A	H	Ş	W	H	
C	H	P	B	I	R
M	Î	N	A	K	R
T	E	Ş	Î	R	Ê
D	E	V	R	Î	S
X	A	K	Ş	N	Û
R	A	S	E	R	R
J	Î	R	E	K	G
F	B	I	Z	A	V
Û	P	Î	R	E	L

PEYVA VEŞARÎ → P I R E J I N




## XAÇEPIRSA BIXELAT (42)

Kominkasyon	Notayek	Birîn	Notayek	Kevan.....	Reh
Avakare Komara Mehabade (wêne)	Zarawayekî kurdî	Cihê ku hestî hev digirin	Çamûr	Cawbir	
Sevalek	8	Spanyol dibêjin		Bi erebî ez	
Cesaret		Ahenga estirumanê			
			Kûsiyên avî	3	Bêav
			Mister		
Serwerî				Rêxistîneka baskî	7
Dijberî				Bajarekî Tirkîyeyê	
		1	Dil		6
			Mêrxas		
Beşek ji aletê cot	9	Nepejrandin			
Cejn		Zemîn			
		Sazî, dezgeh Bersiva neyînî	4		
Pasgirek	5	Mona filme Dastin Hofman			
Anîn					
				Çinavkek	



Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi rîya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 42'an; kaseta Koma Çiya "Dilana Bê Sînor" e.

### Xelata Xaçepirsê



Kaseta Koma Çiya "Dilana Bê Sînor"

Jêrenot:  
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9



# Bonn tovê ku çandibû, diçine

The Europeana 17-23'yê gelawêjê li ser qedexeya PKK'ê ya li Almanyayê bi îmze-ya Tony Paterson nûçe-şiroveyek weşand. Li gorî nivîsê Almanya tovê ku bi qedexeya li ser PKK'ê çandibû, niha diçine. Nivîs pêşî li ser grevên birçibûnê yê Almanyayê disekine. Li gorî nivîskar kurdan bi vê çalakiyê bala çapemeniya Ewropayê kişandiye ser xwe. Bi qasî ku ji nivîsê tê fêmkirin, nivîskar beşdarî civîna ji bo qedandina greva li Berlînê bûye. Di dema qedandina grevê de Berdevkê Çalakiyê Ahmed Sükû bi

van gotina daye zanîn ku çalakî gihîştîye armanca xwe: "Me mebesta serwextkirina raya giştî li ser tevkujiya ku dewleta tirk li hemberî kurdan dimeşîne, pêk anî."

Nivîs balê dikişîne ser bûyerên wekî şewitandin û molotofkirina saziyên tirkan û van livbazîyan wekî kar û reaksiyona kurdan nîşan dide. Li gorî nivîsê li Almanyayê tê pejirandin ku qedexeya vê dewletê

**"Helmut Kohl û Manfred Kanther hêvî dikirin ku piştî qedexeyê pêleke kurt a êrişên PKK'ê were û pişt re jî ew mesele hel bibe."**


ya li ser PKK'ê berevajî encam daye. Tony Paterson di nivîsê de dibêje: "Helmut Kohl û Manfred Kanther hêvî dikirin ku piştî qedexeyê pêleke kurt a êrişên PKK'ê were û pişt re jî ew mesele hel bibe."

Tê gotin ku rayedarên tirk ji vê dewletê xwestine ku rê li ber xebatên 6.900 çalakdarên PKK'ê di nav 500 hezar kurdên Ewropayê de bigire, ev qedexeyê jî wekî bersiva Almanyayê ji wê

daxwazê re tê nirxandin. Hikûmeta alman biryara li Tirkiyeyê vegevandina hinek kurdên tawanbar jî daye, lê gelek hikûmetên federalî yê di bin destê sosyal demokratan de, li ber vê biryarê dibin asteng.

Nivîs cih dide îdiaya rayedarên alman a li ser pêkhatina êrişên li ser saziyên tirkan jî. Li gorî Serokê Îstixbarata Hundirîn a Hamburgê Ernst Uhrlau êrişên ewqas dorfireh inçex PKK kare bi rê bixe. Her wiha rayedarên alman bi nivîskarê The Europeanê didin zanîn hejmara milîtanên PKK'ê li Almanyayê bûye 8.300 û dema PKK bixwaze kare 50 hezar kesî rake ser piyan.

Nivîskar xwe gihandîye Serokê Komkara Almanyayê Mustafa Kısabacak jî. Wî jî hikûmeta alman wekî sedema xurtbûna PKK'ê nîşan daye. Kısabacak dibêje ku tewra Almaniya ya ji bo rêlibergirtina çalakiyên kurdan û çekên ku ew ji dewleta tirk re dişîne kurdên rûnêr jî ber bi PKK'ê dibe. Li gorî serokê Komkarê "Kurd bi awayê nêzîkbûna dewleta alman -ku bi çavê molotofavêjan li kurdên pêner dinêre û çekan dişîne ji bo şerê kirêt- wekî ku îxanet li wan hatibe kirin, diêşin." Ni-




**Greva birçibûnê ya dawî bala raya giştî kişand.**

vîs li ser awayê xebata PKK'ê pêzanînên îstixbarata alman pêşkêş dike. Li gorî îstixbarata hundirîn a alman PKK jî kurdên li vî welatî 30 milyon markî berhev dike.

Tê gotin ku Berpirsê ERNK'ê Ali Sapan niya-za xwe ji bo peywendiyên bi Partiya Hîristîyan Demokratîk (CDU) re diyar kiriye. Bi awayê ku nivîs dibêje, PKK bi riya hikûmeta alman dixwaze politikaya dewleta tirk a li ser kurdan

biguherîne. Tê gotin ku heta niha PKK'ê bi tenê bi çepgir û hawirparêzên alman re têkilî danîne û ev bûyerên dawîn ihtîmala peywendiyên bi CDU re kêmkirin. Dîsa ev gotar dide zanîn ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan Almaniya wekî dijminê duyemîn bi nav kiriye û gotiye ku heke dewleta alman piştgiriya xwe ji bo Tirkiyeyê bidomîne wê problema kurdî li vî welatî tundtir bibe.

Nûçeyên Derve



**Kurd dixwazin ku alîkariya Almanyayê ya ji bo şerê kiret bisekine.**

Piştî ketina Sovyeta berê, îro Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) dewleta Çînê ji xwe re kiriye hedefe nû. Amerîka herdem ji bo windakirin an jî verşartina pirs-girêkên hundurîn pirs-girêkên navneteweyî derdixe. Beriya destpêka Konferansa Jinên Cîhanê ku wê nêzîkî 40 hezar jin ji hemû cîhanê beşdar bibin, DYA'yê bi makîna xwe ya rahigandinê li dijî Çînê dest pê kiriye û li her cihî Çînê bi awayekî negatîf nîşan dide.

Çîn li Asyaya Dûr bûye hêzeke mezin. Heta mirov dikare bibêje ku di cîhanê de jî dibe hêzeke mezin. Bi aborî, ramiyarî û leşkeriya xwe Çîn, îro dewleta Amerîkayê dike tengaviyeye mezin. Bêyî ku ji Neteweyên Yekbûyî (UN) bipirse, Çînê beriya du hefteyan cerbandina atomê û teqandina roketên atomê pêk anî. Bi hejmareke 2. 930 000 leşker, 1 milyar û 200 milyon nifûs

## Şerê Sar di navbera Çîn û Amerîkayê de

ku her sal 14 milyon mirov lê zêde dibin, îro hêza Çînê di civaka cîhanê de nayê veşartin.

Piştî kalbûn û nexweşbûna Deng Xiaoping îro di nav hêz û rêxistinên Çînê de şerek, têkoşîneke li ser serokatîyê dest pê kiriye. Her wiha di navbera Partiya Komunîst û Parlamentoya Çînî jî de nakokî li ser rojevê ne.

Dewleta Amerîkayê bi wan pirs-girêkên di nav Çînê de dizane, lewre jî bi her şeweyî dixwaze dewleta Çînê bi metodên çeper lê tengkirine (Containment) ji aliyê aborî ve qels bike û ji aliyê ramiyarî ve bi tenê bihêle û îzole bike. Peywendiyên Amerîkayê yê nû bi dewleta Vîetnamê re jî ji aliyekî ve ji bo zerardîtina dewleta Çînê ne. Amerîka dixwaze Vîetnamê ji xwe re bike navendeke kapîtalîzmê;

ku karibe metodên nû yê împeryalîzmê ji wê derê bimeşîne. Çawa ku Taiwan di dîrokî de perçeyekî Çînê bû û îro jî Çîne hatiye qutkirin, dewleta Amerîkayê bi fermî Serokê Taiwanê dipêjirîne û Taiwan jî herwiha kiriye navendeke împeryalîzmê ku dixwaze wê hêrême kontrol bike. Di sala 1994'an de Çînê jî hemû dewletên cîhanê zêdetir aboriya xwe bi peş ve biriye û mal û hilberiyên xwe zêdetir firo-tine. Lewre jî dewleta Amerîkayê bi her awayî li dijî endamtiya Çînê a Rêxistina Bazirganiya Cîhanê derdikeve.

Di sala 1996'an de li Amerîkayê hilbijartin ji bo Serokatîyê çêdibe û niha jî kampanyayên hilbijartinê dest pê kirine. Wekî her car her du partî, Demokrat û Kommarvan li ser navê

mafên mirovan siyasetê dimeşînin, îhlalkirina mafên mirovan li Çînê rexne dikin û dixwazin ku hemû dewlet peywendiyên xwe bi Çîne re qut bikin. Çawa Serokê Amerîka Ronald Reagan di dema xwe de li dijî Sovyetê bangeşî dikir û digot: "Sovyet dewleteke ahrîmanî ye" îro jî hikûmeta Clinton dixwaze Çînê bi rengê negatîf û xerab bi raya giştî bide nasîn.

Lewma girtina Harry Wu li Çîne ji xwe kirin halet û ji bo kampanyaya hilbijartinê bi kar tînin. Niha li Amerîkayê êdî Harry Wu wekî listikvanekî di filmekî Hollywoodê de nîşan didin. Le béguman mesele ne meseleya mafên mirovan e. Divêt were gotin ku mafê gelê Tîbetê jî bo azadiyê heye û Çîn divêt mafên wan bide. Lê bi taybetî jî mafê dewleta

Amerîkayê nî e ku ramiyarî mafên mirovan ji xwe re bi kar bîne da ku berjewendiyên wê werin cih. Mafên mirovan li Panama, Guetamal, Somalî, Yugoslavya, Kurdistan û hwd. li ku dere ne, ku Amerîka bi çek û leşkerên xwe an jî bi dûvikên xwe qirkirin û îhlalkirina mafên mirovan li van deran dimeşand û dimeşîne.

Rojnameya fermî ya Çînê Xinhua, di nivîsandina xwe yê hefteyî de dibêje: "Dewleta Amerîkayê divêt dîtînen xwe yê anti-Çîn biguherîne da ku şerekî sar yê nû dernekeve."

Di 30'ê gelawêjê de Konferansa Jinên Cîhanê dest pê dike û cara yekemîn Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê bi delagasyonekê beşdarî civîneke wiha dibin. Em ji hemû beşdarên jinên kurd re xebateke serkeftî û serfiraziyê dixwazin.

**DARA AZADÎ**



FAL



**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Siheta we ber bi başbûnê ve diçe. Lê, divê hûn dev ji xwe bernedîn û dermanê xwe bi kar bînin. Ji bîr nekin ku siheta mirov di pêşiya her tiştî de ye. Heke hûn li gorî rêçeteya dixtor hereket bikin, di demeke kin de tiştêkî we namîne.



**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Hûn çiqas ji rexneyan aciz jî bin, hevalên we ji bo xêra we û başbûna we van rexneyan li we dikin. Gerek e hûn jî rexneyan li ber çav bigirin û xwe biguherînin. Hûn jî dizanin ku gelek tiştan mirov bê zanêbûn dîke.



**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Hûn li benda xeberekê ne. Lê, ev çi bêsebirî ye? Xeber ji bo we çiqas girîng be jî, bêaramî ne baş e. Dema xeber ji we re hat jî, baş bifikirin û li gorî wê gava xwe biavêjin. Wê di jiyana we de guherînin baş çêbin.



**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Xebara ku hûn li bendê ne, wê vê hefteyê neyê. Rewşa xwe ji nû ve, di ber çav re derbas bikin. Biryara herî xerab ji dudilîyê baştir e. Hûn jî êdî qerara xwe bidin. Ev çi hal e? Dem dema qerareke baş û di cih de ye.



**ŞÊN (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Pêwist e hûn dev ji vê betaliyê berdîn û dest bi karekî bikin. Hûn jî dizanin ku jiyana bêyî xebatê nabe. Îro hûn jî kîsê bavê xwe dixwin, lê sibê hûnê çî bikin. Gerek e destê mirov bigihîje ber devê mirov.



**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Van rojan hûn xwe bi taybetî jî, ji havalên xwe dûr dixin. Bi pirtûk, kovar û sinemayê re eleqedar dibin. Rast e, divêt mirov bi çand û hûnerê re eleqedar bibe. Lê, ji bîr nekin ku çand û huner karên civakî ne û bi civakê re dijîn.



**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Hevalekî we wê van rojan bi tekîfêkê were cem we. Li ser pêşniyara hevalên xwe baş bifikirin. Tekîfê binirxînin û li gorî nirxandina xwe biryarê bidin. Hûnê bi nirxandineke baş jê encameke baş bistînin.



**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Hûn hêdî hêdî xwe li gorî nirxên giştî diguherînin. Ev yek jî wê di pêş de firsetên baş derîne pêşiya we. Lê divê guherînen we domdar bin. Ji bîr nekin ku her tişt bi guherînan bi pêş ve diçe.



**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Êdî dev ji van nirxên subjektîf berdîn. Mirovahiya kesane bi mal û milk e. Kinc der heqê mirovekî/ê de tu pêzandinê nade. Dilovanî û mirovahî ne bi mal û milk, bi zanebûn û fedakariyê ye. Divêt hûn vê yekê her li ber çavan bigirin.



**KARİK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Êdî li civatan bes pesnê xwe bidin. Ev yek xelkê derdora we ji we dûr dixê. "Ger hûn dixwazin bila her kes bi başî behsa we bike, wê çaxê hûn behsa xwe nekin." Vê gotina Paskal ji bîr nekin û li gorî vê gotinê hereket bikin.



**DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Birayên we, li derdora we xelkê zivêr dikin. Ev yek jî we diêşîne. Hûn ji vê yekê digel êşînê û şerm jî dikin. "Di her malbatê de fêrişte jî hene, şeytan jî." Ev gotina Joseph Roux wê ji bo demekê be jî we ji hestên nexweş dûr bixe.



**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Rast e pirtûk dostê mirov yê herî baş in û gava mirov cara pêşî pirtûkekê dixwîne, mîna ku mirov ji xwe re dostekî nû peyda bike dixuye; gava mirov cara duduyan bixwîne, mîna ku mirov dostekî xwe yî kevin bibîne ye.

Kî 'enayî' ye?!



Yekî kurd li Stenbolê li ser Pira Galatayê bendewarê vapûrê ye da ku derbasî Uskudarê bibe. Di vê navberê de dixwaze cixareyekê vêxe, lê agirê wî nîn e. Yekî tirk jî ji bo derbasî Uskudarê bibe tê li cem wî radiweste. Yê kurd daxwaza agir jê dike, lê yê tirk, ji dêvla agir elektrîka di dest xwe de vêdixê û dirêjî ber cixareya yê kurd dike. Yê kurd jî, cixareya xwe bi ser elektrîkê de xwar dike û deng ji xwe nayîne. Ev rewşa han, heta bi hatina vapûrê didome. Piştî hatina vapûrê, pêkve lê siwar dibin. Yê tirk berdewam dikene. Ev rewşa yê tirk bala rêwingiyana dikşîne û wisa jê dipirsin: "Te xêr e tu bi çi dîkenî?"

kir û bû kufkufa wî heta ku vapûr hat."

Li ser vê gotina yê tirk rêwî pêkve dikenin lê, yê kurd ji hemûyan bêhtir dike. Vê carê yên rêwî li yê kurd kom dibin û her wê pirsê ji yê kurd jî dikin: "Te xêr e, tu bi çi dîkenî?"

Yê tirk: "Gava em li ser pirê bûn, kurdekî 'enayî' ji bo vexistina cixareya xwe agir ji min xwest. Min jî elektrîk da ber û wî jî cixareya xwe bi ser elektrîkê de xwar

Yê kurd: "Gava em li ser pirê bûn, ji bo vexistina cixa-

reya xwe min agir ji yekî tirk xwest. Wî jî li şûna çeqmaq elektrîka xwe vexist û da ber cixareya min. Bi rastî min nedizanî ku yê tirk hewqas 'enayî' ye. Min jî cixareya xwe danî ser elektrîka wî û min deng ji xwe neanî heta ku pîlên elektrîka wî qediyar..."

GELÊRÎ

Xwexapandin

Teyrê baz li ser zinarekî datîne û der dora xwe qoleçan dike. Dibîne ku roviyek li biniya zinêr diçe û tê. Rovî ji xwe re li xwarinekê digere. Her di wê gavê

de kewek jî ser berekî dilîse ku nêzikî baz û rovî ye. Kew dest bi xwendinê dike û dibe qebeqeba wî.

Rovî nêzikî kew dibe û dibêje: "Hey mala te û vê qe-

beqeba te xera bibe. Ma tu nawestî, qirika te naêşe? Ma xewa te nayê?"

Kew dibêje: "Xewa min nayê, lê dîsa jî, ezê hinekî çavên xwe bigirim.

Gava ku kew serê xwe dixê bin baskê xwe, rovî jî ber bi kew ve diçe û ji nişkave xwe diavêjê û wî dixê devê xwe. Baz jî li wan temaşe dike. Kew ji rovî re dibêje: "Tu dê min bixwî, xweşî can be. Lê berî tu min bixwî, ez dixwazim tu bibêjî elhemdullillah."

Rovî daxwaza kew naşikîne û dibêje: "Elhemdulillah." Gava ku rovî wisa dibêje, kew direve û li nêzik datîne û dibêje: "Yê ku xewa wî neyê rakeve bêbav be." Rovî dibêje: "Yê ku têr nexwe û şikra xwe bîne sekbav be." Baz dibêje: "Yê ku azadiya xwe neparêze kerbav be."

ABBAS ALKAN



Tu derkeve, bila deve têkevê

Li gundekî mirovekî bostan çêkiriye. Sibe Lhekê radibe ku deve ketiye nava bostanê wî. Bi lezgîniyê dihere ku deve derîne. Yekî gundiye wî ku dixwaze zirare bidê, dihere ku alikariya wî bike. Lê belê zebeş û pêtêxan dixê destê xwe û diavêje devê.

Xwediyê bostan dinêre ku ev ji devê xerabtir e û zirarê pir dide bîstanê wî. Li ser vê yekê gazî wî dike û wiha dibêje:

- Haho lawo, tu derkeve bila deve tê de be, bila deve tê de be.

ÇIYA MAZÎ

Serpêhatiya Galîle

Di dadgeha engîzisyone de, Galîle dema tê darizandin, ditirse û ji ramanên xwe yên zanyarî tawîzan dide. Li ser vê yekê şagirtên Galîle, dikevin xemgîniyeke bêhempa û dibêjin:

- Gelek heyf e ku ev welat ji parastina qehremanan mehrûm e. Li ser vê yekê Galîle jî dibêje:

- Gelek heyf e ji wî welatî re ku çavê wî li qehremanan digere ku wî biparêzin.

KEDKAR ÇÎN



# Kurd û şerê navxoyî

**Xweziya kurdan bikarîbûna ji tecrûbeyên gelên cihanê sûd bigirtina û rê li şerên navxoyî yên sibê bibiriyana. Mixabin, rêbirîna li şerên wisa dê gelekî dijwar be. Loma kurdên mirov-û-netewehez û yên zana pêwîst e bi hemû şeweyan têbikoşin, da ku dîwaran li pêş şerên navxoyî yên nîfşên îroj, sibe û dusibe çêbikin û çareyan ji gelsên ku dikarin agirê şer vêxin re, bibînin**

nav endamên mezheban û tayên ji aliyê komên jimarmezî de li komên jimarbiçûk bûne, wekî tadeyên li êzîdî, ermenî, alewî û xiristiyân û cihûyên bûne û şerê di navbera partiyên kurd de; lê talîha kurdan baş e ku li gel hebûna ewqas faktorên ji bo şerên ehli munasib ji şerê mezî di navbera gelê kurd xwe bi xwe de hîn cih negirtiye.


Bi baweriya min, sedema herî girîng ya vê yekê hebûna tiştêkî muşterek e: Bindestbûna tevahiya gelê kurd. Bindestbûna kurdan û stemkariya li ser wan hestekî neteweyî li gel wan afirandiyê ku dikaribûye neyartiya di navbera wan de li sînorekî rawestîne. Sedeme din jî bindestbûn û beşbûna Kurdistanê ye ku gelê kurd ji hev veqetandiyê û hiştiye gelek gelsên di navbera kom û beşên wî de nixamtî bimînin.

sedî ji sed têxe qalibekî. Pêkan e (mumkin e) di nav hinan de hindêk taybetiyên muşterek jî hebin.

Ev zihniyet îroj di sîtîlekê de dikeline. Hindêk jî wan xwe ji yên din bêhtir xewan dikine, hinên din li gel potansiyêke bi hêz jî nikarin xwe di nav ava sîtîla mezin de bigihînin hev. Yek ji zihniyetên ku xwediyên wan nikarbûne xwe bi şeweyêke rêk û pêk bigihînin hevûdin û bikin komeke bi hêz ya sosyal-demokrat e ku îroj di nav entellektuelên kurd û burjucvaziya biçûk ya kurdî de xwe bi cih dike ye, li derve û hundir. Zihniyeta milîtan, bi encama ji hevbelavbûna Yekîtiya Sovyetê û guhertinên mezin di siyaseta cihanê de, wê di salên dahatû de neçar bimîne ku siyaseta xwe nermtir bike. Li milê din, tevî ku çu caran zihniyete olîn ya radîkal li nik kurdan bi hêz nebûye jî, welatine derve dê hewl bidin ve



Celal Talabani



Abdullah Öcalan



Mesut Berzani

Li hejmareke ne biçûk ji welatên cihana me, şerên navxoyî (ehli) cih girtine. Ev şer li welatên wekî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Çînê, Rûsistanê, Fransayê, Spanyayê, Vietnamê, Hindistanê, Somalî, Komarên Yûgoslaviyaya berê, Lubnanê û gelên din bûne sedema mirina bi milyonan mirov û zirareke aborî ya pir mezin e. Sedemên van şeran olî, mezhebî, çînî, siyasî, neteweyî, aborî, nijadî û hinên din bûne.

Li Kurdistanê ku hema-hema hemû faktorên li welatên din bûne sedemên şerên navxoyî hene. Ji haliyekî de mirovên xwedan mezhebên olî yên cur bi cur, ji aliyê din de axîfgerên zaravayên cuda; li milekî siyaseta û partiyên pirjimar, li milê din belengazî û dewlemendî; li layekî yên bi îrsar Kurdistanê serbixwe dixwazin, li layê din ew yên di rewşa îroj de bi mafine çandî û neteweyî razî ne; û her wiha. Helbet ne carekê, lê gelek caran şerê navxoyî li beşîna Kurdistanê bi şeweyên cuda cih girtiye, wekî şerê nav eşîran, şerê

Di rewşa îroyîn de li ser hemû faktorên li jor hatine binavkirin faktoreke din xwe aniye holê. Ew jî ferqiyeta zihniyetê ye. Di nav kurdên îroj de, li gor dîtina min, ev zihniyet di nav kesên "bi siyaseta ve mijûl" hene: Zihniyeta milîtanî, zihniyeta xwepereştî (neteweyî, lê muhafiz) zihniyeta olî, zihniyeta çep, zihniyeta sosyal-demokrat, zihniyeta ji teorî û baweriyên cuda û zihniyeta yekîtiwaziyê.

Ji bo zihniyeta milîtan mirov dikare Partiya Karkerên Kurdistanê wekî nîşe bide, ji bo zihniyeta xwepereştî Partiya Demokrata Kurdistanê, ji bo zihniyeta olî partiyên îslamî yên kurdî, ji bo zihniyeta çep partiyên komünîst yên kurdî, ji bo zihniyeta sosyal-demokrat hejmareke mezin ji entellektuel û kevnesiyasiyên kurdan û ekola bi rehmetî Dr. Qasimlo, ji bo zihniyeta ji teorî û ramanên cuda Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan, û ji bo zihniyeta yekîtiwaziyê ew ên dixwazin ji bo xatirê yekîtiyê li hember neyaran muşterek hemû cudabûna ramanî û siyasî bête ji bîrkirin. Helbet, mirov nikare van zihniyetan û taybetiyên wan ji

zihniyetê bi hêzîtin bikin, tiştêkî ku ne li berjewendiya gelê kurd e.

Xweziya kurdan bikarîbûna ji tecrûbeyên gelên cihanê sûd bigirtina û rê li şerên navxoyî yên sibê bibiriyana. Mixabin, rêbirîna li şerên wisa dê gelekî dijwar be. Loma kurdên mirov-û-netewehez û yên zana pêwîst e bi hemû şeweyan têbikoşin, da ku dîwaran li pêş şerên navxoyî yên nîfşên îroj, sibe û dusibe çêbikin û çareyan ji gelsên ku dikarin agirê şer vêxin re. Ji bo gelekî ku kesên xwendevan di nav de kêm in, weşanên hevbeş (muşterek), ji bo wan nîn in, û xwediyê gelek neyaran in, rêbirîna li şerên navxoyî dê pir û pir dijwar be, lê li gel wê jî perwerdekirina ciwanên îroj ji bo hevbeşandin û hevûdinpejirandinê pêwîst e armanca her partî, weşan, nivîskar û bav û dayê be, ji ber ku ciwanên îroj bavên sibe ne. Tenê bi riya hevûdinfehmkirinê, hevûdinbeşandinê û yekîtiyêke bi riya hevûdinqebûlkirinê mirov dikare rê li şerên navxoyî bibire.

ŞAHÎNÊ B. SOREKLÎ

Yên berî me çî, çawa dinivîsandin?

## Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 27. a Kovara Hawar  
Mêjû: 1941, 15'ê avrêlê

### ÇIYAYÊ SASONÊ

Ev çiya wek pir çiyayên Kurdistanê çiyakî asê û pêgera wî dijwar e. Lê ne wek piraniya çiyayên mayî nenas e. Ji mêj ve bi xurtî û mîrxasiya eşîrên têda, di welatê kurdan da bi nav û deng e.

Tevî vê bi nav û deng bûnê, ez bawer im, tiştên ko di heqê vî çiyayî da zanîn divê, her kurd nizane. Ji ber vê yekê, ez dixwazim zanîna xwe ya di heqê vî çiyayî û eşîrên wî da serpillî raveyî xwendevanên Hawarê bikim.

Çiyayê Sasonê: Di nîveka Kurdistanê bakur û navbera bajarên Serî, Mûş, Bidlîs û Diyarbekirê da bi navê çiyayê Sasonê çiyayek heye. Ev çiya ji berê da bi dijwariya cih û mîraniya xelkê têda bi nav û nas e. Ji roja ku biyanî ketine welatê kurdan heya îro xelkê wî çiyayî serên xwe ji wan ra danênin e û berê tîfinga xwe ji wan ra danênin e û berê tîfinga xwe ji singa wan ne guhastin e.

Ev çiya bi sinorên jêrin dorgirtiye. Rohilat: Motikan, Roava; Silîvan û Genc. Bakur: Deşta Mûşê. Nîvro: Deşta Xerzan.

Ev cihê ko bi çiyayê Sasonê bi nav dibe, ji bîst û sê çiyayên mezin û biçûk biheketî ye. Çiyayên han her yek xweyî nav û bi geliyên kûr ji hev cida ne. Di nîveka van çiyayan da, bi navên Karmilêh, Karnêk û Arzîv sê çiya hene ku bi bilindî û rêdijwariyên xwe hatine nasîn. Navbera van her sê çiyayan bi çemên Artîrêrê û kuskêt ji hev diqetin.

Çi gava ji xelkê Sasonê teng hatiye, anê hikûmetekê bi ser wan da girtiye, xwe avêtine serên van her sê çiyayan û xwe di navçavên wan da ji hingên neyaran parastine.

Piştî ko me Karmilêh, Kornêk û Arzîv ji çiyayê Sasonê ra sernîvek nîşan dan, rewşa erdnîgariya yên mayî holê dimine. Di rohelat da çiyayên Ferşek, Sipîrgîş, Kêkîrnûs, Pûragan û Şînas. Di roava da çiyayên Helqîz, Qendîl, hatûra, Qemtûra, Dêrgeretînu Herşewat. Di bakur da çiyayên Horemor, Reben û Mere o. Di nîvro da çiyayên Lele, Helizdirûnan, Şelaş, Mirîçîne, Kekwas û Milêxaçê. Bi tevayîya van bîst û sê çiyayan û dorhêl û kûntarên wan ra çiyayê Sasonê tete gotin.

Zivîstana çiyayê Sasonê wek pir çiyayên Kurdistanê di dawîya çîriya pêşin da dest pê dîke û heya nîveka gulanê bi serma, berf, teyrok û bager e. Xesma aşîtên ko ji nerm bûna berfê dadikevin, ji her bôbelatê pirtir mirovan ditirsînin. Ji ber serma, berf û piraniya aşîtan, ji bo biyaniyan, zivîstanê di çiyayê Sasonê da gerîn dijwariyêke ko nayê li pî kirin.

Eşîrên Sasonê: Di nav û dorhêlên çiyayê Sasonê da hevde eşîr hene. Ji van eşîran Ezebo, Pisino, Zekerî, Mûsî, Bûbî û Şerwên di nav bîst û sê çiyayên ko me navên wan li jor gotî da dimînin. Herçi eşîrên Sarimî, Xî, Badikî, Bozikî, Bidirî, Şîgo, Celalî, Timoqî, Bekiran, Welo, Mehmûd di dorhêl û kûntarên çiyê da ne.

Ji van eşîrên han, hinek mezin û hinek biçûk in. Tevayîya gundên van eşîran digihin heft sed û panzde gundan. Ev gundên han, mezin û biçûk di zik hev da bêne hesibandin, her gundek 50-60 mal bi derdikeve.

Lê îro ev eşîrên han hemî ne di cihê xwe da ne. Ji sala 1925 an heya digehe sala 1940 î, ji şerên ko di navbera wan û tirkan da bûyî, eşîrên Şerwên, Ezebo, Mûsî, Zekerî, Pisino û Bûbî di hev da ketin e, gundên wan hatine şewitandin, xelkê wan hinek di şer û hinek jî di riyên nîfî û sirgûnan da hatine kuştin û yên mayî cihên xwe berdane. Îro ew di ser û navçavên Karmilêh û Kornêk da dimînin. Herçi eşîrên mayî di cihê xwe da ne û xwe ne lebitandin e.

OSMAN SEBRÎ



Rewşenbîrê kurd Dr. Kemal Mîrawdêlî der barê çand û siyasetê de pirsên me bersivandin:

# Dijmin me yek dibîne çima em bi xwe nebin yek

**D**r. Kemal Mîrawdêlî wekî gelek rewşenbîrên me bi helbestê dest pê dike û çend pirtûkan jî diweşîne. Wê yekê bi rewşa bavê xwe Memend Axayê Fanî ve girê dide ku ew bi xwe helbestvan bûye. Piştî re Mîrawdêlî dest bi xebatên lêkolînên rexneyî dike û di vî warî de jî berheman diafirîne û diweşîne.

Mîrawdêlî bi wan jî qîma xwe nayne û li derve karê siyasî rojnamevanî dike. Dr. Kemal de, di civakê de bandor lê kiriye ku bi mijarên ji hev cuda têkildar bibe. Her wiha piştî ku beşa îngilîzî dixwîne deriyê rojavayê (di warê rexne û felsefeyê de) lê vedibe.

Bi vî awayî dest diavêje rexneriyê û li ser Goran û realîzama sosyalîst rexneyên xwe pêşkêşî gel û eleqedarên dike. Ev bûyer di despêka salên 1970'yî de rûdîdin û di 1973'yan de vedigere Qeladizê. Li kutupxaneyê ku lê qutabî (şagird) bûye dest bi mamostetiya zimanê îngilîzî dike. Mîrawdêlî wiha dom dike: "Roja 24.04.1974'an tu car jî bîra min naçe ku firokeyên "saxoy" ên dewletê hatin û Qeladiz bombebaran kirin. Di wê demê de min ders dida xwendekarên xwe. Şaşiyê mezin bû bajarê din hatibûn valakirin û ji bo vî yekê jî Zankoya Sulêmaniyê jî anibûn Qeladizê. Diyar e, ev jî plana Savak'ê (îstixbarata Îranê ya wê demê) bû. Ji bo vî tiştî pere jî didan."


Di wê demê de li Qeladizê kovarek bi navê "Asoy Pêşkewtin" jî diweşînin. Piştî hejmara sisyan Qeladizê tê bombebarankirin û taxeke bajêr tev xerab dibe. Hawar û qîrên mirovên taxê bandoreke mezin lê dike û nema mamostetiya dike û dikeve nava şoreşê. Lê dibêje ku di nava şoreşê de azadî tunebûye û nivîsek bi navê "Istatîkya Xwên" dinivîse, kovara Nûserî kurd jî newêre wê biweşîne.

Dr. Kemal Mîrawdêlî gotinên xwe wiha didomîne:

"Di nava şoreşê de, li Gilala, Hacî Umran û Nawpirdan. Ez 6 meh di nava şoreşê de mam, lê ezmûneke nexweş bû, kar û barên me ji aliyê generalên Îranê ve dihatin birêvebirin. Pere, xwarin û çekên pir, ji me re dihatin, lê çawa, ji bo çî, tu kesî nizanîbû. Ev hemû şer, kuştin û xwîn çawa kuta dike? Pirsên me pir bûn, lê belê bersiv tune bû. Piştî demê ke kin heres (têkçûna 1975'an) çêbû. Ew bûyera mezin û bêguman buyêrên din jî, wisa kirin ku ez helbet binivîsim, bi hêvîkirin ji bo riyekê nû, hêviyê nû, jiyaneke nû, xebateke nû û fikreke nû."

Piştî ku we gelek salên xwe li lêgerîn û lêkolînê daye, niha hûn rexne û lêkolînên kurdî çawa dibînin?

- Ji bo derketina rexneyê çend merc (şert) pêwîst in; civateke ku aştî û asayîşa siyasî tê de be pêwîst e, civateke ku pêşketina aborî tê de be û desteke (grub) rewşenbîr hatibe xuyakirin û şaxên zanist di encama wê pêşketinê de hatibe parvekirin. Dema ku min pirtûka "Felsefey Ciwanî û Huner" nivîsand, ji bo zanista siyasetê destpêkek bû. Em hemû siyasetê dikin, lê pirtûkeke me ku qala siyasetê bike tune ye. Der heqê siyasetê de baştirîn pirtûk ji aliyê Arîsto ve hatiye nivîsandin, lê kurdiya wê tune ye. Em ku li Iraqê her tim mijûlî marksîzm-lenînizmê bûn, pirtûkên wan di destê me de tune bûn. Hinek tiştên kêr hebûn, vêca tunebûna pirtûkên çavkanî, tevgera rexne û lêgerînê jar dike. Carinan helbestek bi tenê qala cotkar û karkeran bikira, êdî helbesteke baş û nivîskarê wê jî pêşverû bû. Çawa hatiye nivîsandin, ziman û teknîka wê çawa ye, efrandina wî bi xwe ye an na, ne girîng bû. Ev ne rexne ye. Di rexneyê de gerek e ji wê têkêstê bigihîjî ku der heqê wê de, dinivîsî, ji fikra nivîskar, zimanê



wî, şewaza (ûslub) wî û hwd. fêm bikî. Di gel wan tiştan tev jî, ji destpêka 70'yan û bi vir de rexneyên baş hatin nivîsandin.

Îro li arşiva rojname û kovarê kurdî binêre, heya ku lêkolîneke baş tê şandin, bi dehan û sedan helbest tê şandin. Em ji bo vî yekê çî bikin û rola weşanên me di wî warî de çî ne? Em çawa bikin ku nîrx û behayek bi lêkolînê bê dayin?

- Zor hêsan e, niha ez bernameyek ji te re bibêjim ku lazim e mirov çî bikin. Mirov dikare xewnan bibîne û hêviyên xwe bide xuyakirin, lê çekirin çawa dibê, ereb dibêje: "Çav dibîne, lê dest nagihîjê" Problema kurdan bi rastî siyasî, siyasî û siyasî ye, girifta (problema) çewsandina neteweyî ye, girifta bi darê zorê bi paşveixinê ye û girifta tunebûna dewletê ye. Saziyên me yên dewletbûnê nîn in, em bi xwe jî çênakin. Ji bo van tiştan jî, niha ezê bibêjim: "Pêwîst e em wisa bikin û kovar û rojnameyên me wisa bikin", ne rast e, pêwîst e sazî hebe û ew sazî jî planên xwe çêkin. Lê belê li nik me plan û bername nîn in. Me bi xwe di destpêka

weşana rojnameya xwe de "Hengaw" piştgiriya xwe ji bo Parleman û Hîkûmeta Federal a Başûr da xuyakirin, lê niha em li dijî wan dinivîsin, diyar e ku ev ne gunehê me ye jî, lê dîsa plana me xera dike. Vêca niha weşanên me bibêjin em lêkolînê dimeşînin, baş e, lê gerek e berî wê lêkolînerên (lêkolînan) me hebin, ji bo vî yekê pêwîst e sazî bîn çêkirin, wekî Înstîtuya Parîs û Berlînê. Li Ewropayê girifteke din jî heye, pispor û akademiyên me ji ber mijûlî jiyana û karkirina xwe dibin, nikarin dema xwe gişt bidin xebata zanistî. Lewma pêwîst e îstîtûyên me bernameyê wan ên wergerandinê hebin, ne pêwîst e em ji sifirê dest pê bikin. 15-20 pirtûk hene, pêwîst e bîn wergerandin, ne pir in, lê ji bo me pir girîng in û gerek e li kurdî werin wergerandin.

Baş e hûn kovara Lêkolîn a Înstîtuya Berlînê çawa dibînin?

- Nivîs û babetên wê baş in, lê mixabin min baş ew nexwendiyê, tiştên ku li wir hatine weşandin, ew in ku ji me re pêwîst in. Ew kovar gerek e bibe beşekî girîng ê Înstîtuya Berlînê ya ji bo Lêgerîn û Lêko-

### Dr. Kemal Mîrawdêlî

**L**i Kurdistana Başûr ji diya xwe bûye. Xwendina xwe ya pêşîn, navendî û amadeyî li bajarê Qeladizê kuta kiriye û li Bexdayê beşa Îngilîzî li Fakulteya Edebiyatê qedandiye. Di sala 1978-1981'î de bûye Serokê Şaxa Silêmanyê ya Yekîtiya Nivîsakarên Kurd. Di 1983'an de doktoraya xwe di Edeba Rojhilatnasiyê de diqedîne. Sala 1991'ê di zanista aborî de mastereke din jî kuta kiriye. Li derveyî welat

beşdarî gelek karên siyasî û civakî bûye. Li Londonê bûye Serokê Komîteya Kargerîya navenda Rewşenbîriya Kurd. Di van kovar û rojnameyan de xebitiye: Kovara Helwêst (Sernivîskar), Kovara Peyiv (sernivîskar) û Kovara Rabûn (Desteya nivîskaran). Niha jî Sernivîskarê Rojnameya "Hengaw" e ku mehê carekê li Londonê derdikeve. Yek ji damezrînerên Kongîreya Gelê Kurdistanê ye li Îngilîstanê ye jî.

lînen Zanistî.

Dixwazim li vir qala rawestana kovara "Hîwa" ya Înstîtuya Parîsê bikim. Îmkana wan pîre, 7 milyon frankê wan heye, çima nikarin kovarekê biweşînin? Min nû rawestana wê ji xortekî pîrs kir ku berê Cîgirê Serokê Înstîtuyê bû, mixabin bersiva wan tune ye. Min jê re got: "Hemû amadekirinên wê kovarê bila di stûye min de be û asta wê ya edebî jî, heke ku weşana wê zehmet be, ezê weşana wê jî hildim ser xwe, bi tenê hûn mesrefa wê bidin. Êkekê min nakin, çî dibêjî?"

Baş e we got ku girifta me siyasî ye, em çî bikin ji bo ku rewşenbîriya kurdî jî, mil bi mil bi siyaseta kurdî re rolekê bilîze, çî bikin ji bo xemilandina siyaseta xwe da ku kurd jî malek an konekî wan hebe?

- Di demekê de ku ez dibînim Qeladizê bajarê min î xoşewîst, dişewite û gelê wê jî Enfal dibe, ji min re zehmet û asteng e ku rûnişim helbest û rexneyên edebî binivîsim, na ez diçûm, min karê siyasî dikir. Niha ji ber ku partiyên kurd li Başûr wisa dikin, ez guhdarî zarokekî Sulêmanî dibim, nikarin bi karên siyasî ve mijûl

nebin. Pir caran dibêjim, birya (xwezî) min karibûya mejiyê xwe biguheranda û bir ji wan karan tev nekim û wan hemû azaran neçêjim. Divêt em her du tiştî bi hev re bidin meşandin, siyaset û afirandina hunerî. Divêt hem wekî siyasethanekî xizmet bikin, hem jî, di wî warê ku em tê de pispor in de, bixebitin.

Niha MED TV'yê fersendeke baş çêkiriye, ji di MED TV'yê de tu dikarî lêkolînên edebî pêşkêşî bikî, lê ji bo niha bi tenê lêkolîneke edebî nîn e, peyameke siyasî ye jî. Kurdên me yê Bakur 70 salî nikaribûn bi kurdî bipeyivin, lewma niha kampanyaya parleman dibêje "Bi kurdî, bifikire, bipeyive, bixwîne, binivîsîne" Ji ber ku dijmin ji wî zimanî pir ditirse. Neteweyeke 15 milyonî (tenê di parçeya Bakur de) zimanê xwe tekûz bike, yanî dewleta wî çêdibe. Lewma Tirkiye ji wê yekê ditirse. 15 milyon yek gotin û yek stranê bibêje manaya wê çî ye?

Di meydana edebiyata me de, helbest cihekî berfireh digire, vî carê em qala wê bikin. Hûn doh û îroya helbesta kurdî çawa dibînin?

- Li cem kurdan erk û




barê helbestê, pir giran e. Divêt helbest kin, lîrîkî û musîkî be, mijareke ciwan (bedew), mijareke însanî û wijdanî bi xwe re bigire û bi şeweyeke sivik wan tiştan îfade bike. Lê li cem me barê wê zor bûye. Dema Goran ne wisa bû, wî dixwest ku helbest wekî şeweyekê, wekî zimanê kurdî û wekî ezmûneke kurdî çêbike. Nalî jî, her wiha hîs kiriye ku pêwîst e ezmûneke xwerû bi kurdî hebe. Ehmedê Xanî jî, ew kurdî bi kar tanî ji bo afrandineke ku xelk dizane çî ye, li cem Xanî mebest ji bikaranîna kurdî bûye û destaneke mezin a kurdî bik çarçoveya wê bi kar aniye. Nalî dixwaze bibêje, kurd jî dikarin helbestvanên mezin derxînin û bi zimanê kurdî jî, li hemberî Hafîzê Şîrazî rawestin û yên ji wî jî mezintir bigihîjin. Goran jî dibêje: "Kurd dikarin helbestên nû çêbikin, gava ku li zimanê xwe yê resen veşandin, bi vegera kurdî li deqên resen û gelêrî ev helbesta nû wê bê efrandin." Her siyan jî (Ehmedê Xanî, Nalî û Goran) serkeftinên mezin bi dest xistin.

Îro jî nêrîna min ne wisa ye, tê gotin ku helbesta kurdî tiştê de tune ye û lasayîya (teqlîda) Ewropa ye. Na tiştên mezin û afirandinên bedew tê de hene, bo çûnên nû tê de ne. Helbest jî bi pêş ve diçe, ew pêşveçûn jî, behaneyê taybetiya wê ji bo pêvajoya xwe heye. Lewera bi ya min helbesta kurdî ji aliyê xemlandina xwe ve ne bi paş, lê ber bi pêş ve diçe.

**Em hinekî jî pirsra çîroka kurdî bikin, hûn çîroka kurdî û bizata wê çawa dibînin?**

- Ji bo îroya çîroka kurdî, dibe ku zehmet be, lewre helbest xwendina wê hêsantir e. Ez nikarim navên çîroknîvîsan bibêjim, naxwe pir çîroknîvîsên me yên baş hene. Bi rastî jî, gava mirov tê ev der (rojawa) û li berhemên wan mêze dikî, yên me ji wan ne kêmtir in, lê em hemû tiştêkî bêgane (biyanîyan) girîng û mezin dibînin. Her wiha cihê keyfxweşiyê ku serbarî karesatên mezin in jî,



Dr. Kemal Mirawdelî (li milê rastê) û berpîrsê me yê Berlînê Sîrwan Reşîd

komek roman derketin ku bersiva nivîskarên wan bû. Min di cihekî din de jî gotiye, heke di edebiyata kurdî de fersendên azad hebin û bêhneke berfireh bê kişandin, dê roman bi şeweyeke bi hêz ji dayik bibe.

**Bi ya we di edebiyata kurdî de roman heye?**

- Belê roman heye. Di edebiyata me de romanên baş hene Şar-Bajar a Huseyin Arif, Heres û Segwer a Muhemed Mukrî û berhemên mamosta Îbrahîm Ahmed. Her wiha romana Heme Kerîm Arîf jî heye ku hê nehatiya weşandin. Ew tev jî, şeweya teknîk û dariştin û pilota romanê ne. Eger du sal aramî hebe û derfeta weşanê hebe, tiştên hêja û romanên baş dixuyin. Yan jî, em dikarin li Ewropayê derfeta weşana wan romanên bibînin û ji wan re biweşînin, romanên me hene.

**Niha jî, em derbasî mijareke din bibin. Hûn li ser Parlamento ya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt çawa difikirin û çawa li meseleyê dinêrin?**

- Ji bo çêkirine civateke şaristanî, pêwîst e saziyên hemdem û demokratîk hebin. Pîroz-tîrîn sazî li ba her gelekî ku wan mercan çêbike û wisa dike ku bi rêka peyv, eqil û danûstandin giriftan çare bike, par-

man e.

Parleman wekî nav, bîr û gav girîng e. Xuya ye ku kêmasiya wê heye û pir e jî, lê ji ber ku wekî gelên din derfeta me yî din nîn e, bêguman ew kêmasî çêdibin. Min got wekî bîr tiştêkî girîng e, bi taybetî ku em wê bi parlamentoya Başûr re berawirde (muqayese) bikin, li wir hilbijartin çêbû, parleman hat avakirin, lê partiyên me ew xistin bin lingên

mêzekirin, qey em dikarin xwe birêve bibin an na. Heke em bikarin xwe birêve bibin, pêwîst e saziyên hemdem ku li ba her kesî heye, li ba me jî hebin, diyar e berî her saziyê jî, parleman tê.

Heke ku hevalên Bakurî jî, yan PKK bi propagandayê nav hêzên kurd bi tenê wekî grubeke terorîst bîn binavkirin, îro hat selmandin (îsbatkirin) bi tenê ew in ku ji bo tiştên şaristanî

hew qas heye ku bi giranî niwêneriya Bakur dike, ne ya hemû Kurdistanê. Bila hinek hevalên parçeyên din hebin, wekî sembola yekbûnê pîroz e. Lê dîsa nabe ya hemû Kurdistanê, lewre gereke berfirêrtir bikin û kurdên parçeyên din jî bi şeweyeke şayan cihê xwe tê de bigirin.

Em ji zû ve mijûlî kongreya gelê Kurdistanê ne (li Îngilistan). Me biryar standiye, bi her awayê be, divêt bi wê parlemanê re teba û hev-cot bin û hêviya me ew e ku di pêşerojê de em hemû û kesayetiyên serbixwe jî, bibin yek. Dema wê hatiye, dijmin me yek dibîne, êdî çima em bi xwe nebin yek.

Me divêt wekî netewe bi jin bin, mesele ne cûdaxwazî û tiştên din e, em ne li dijî tirk, ereb û ecem in. Lê belê ew jî zîyan (zerer) dikin, ne bi tenê kurd. Li Tirkiyeyê binêrin bê di çî rewşê de dijî. Tunebûna azadiyê, hilweşîna aborî, tunebûna asayîşê hwd. Tirkiyeyê bi vê rewşê nabe ewrûpayî.

**Der barê rojnamevaniyê de jî, ez dixwazim pîrsekê arasteyî we bikim. Hûn rojnameya "Hengaw" diweşînin û wisa dixuye ku hûn dixwazin rojnameyê xwerû bi rengê neteweyî bixemilînin, lê hinek hene ku xwe wekî weşana parçeyekî welat**

**Di edebiyata me de romanên baş hene Şar-Bajar a Huseyin Arif, Heres û Segwer a Muhemed Mukrî û berhemên mamoste Îbrahîm Ahmed. Her wiha romana Heme Kerîm Arîf jî heye ku hê nehatiya weşandin. Ew tev jî, şeweya teknîk û dariştin û pilota romanê ne.**

xwe. Desthilat nedan parlemanê û nehiştin serokên partiyên beşdarî parlemanê bibin. Parleman û hikûmet heye, lê belê her tişt di destê Kek Mesût û Mam Celal de ye. Vê dubendiyê wisa kir ku parleman tu tiştêkî nîn e. Belkî berevajî ve yekê du kesên din ku li derveyî parleman in, her tişt di destê wan de be û bikaribin mirov îdam bikin û pere belav bikin. Parlemanê dagir bikin û dikarin nêviyê Kurdistanê ji xwe re bibin û gel li hev bidin û her yek ji xwe re peywendiyên siyasî bi derve re datînin.

Îcar îro li me wisa tê

gav diavêjin. Her wiha HEP û DEP ku bi hilbijartinê ketin parleana Tirkiyeyê, niha naveroka wê parlemanê pêk tînin. Eger parleman hebe, ev parleman, parleana rasteqîna gelê kurd e, an jî, beşê gelê kurd di parleana Tirkiyeyê de temsîl dike. Ev parleman mafdar e, lê ew naçar kirine ku bireve cihekî din ku ev jî derveyî welat e. Lewma li virê (Ewropayê) jî em wekî kurd bi şerî dizanin ev heval dîsa niwênerên (temsîlvan) kurdan in û em ji wan re rêzdar in, heya ku li welat vedigerin. Ev parleana rêzdar e, lê

dibînin, hûn vê rewşê çawa şirove dikin?

- Ev beşek ji wî eqle paşverû ye ku dijminên me bi ser me de teriz kirine. Eql û hişê parçe parçeyî û navçigerîtiyê. Bexdadê bibînin, lê Diyarbekir û Mehabadê nebînin. Ew xencera ku li me xistin, ji wê çîwar şiwênê ve hat. Partiyên me jî rastî nedigotin, nihêniya arîkariya xwe nedigotin û ji bo berjewendiya kurd jî nîn bû. Belkî ji xwe re dikirin. Partiyên me bi xwe, xwe ji vê fikra ku kurd bibe yek, distiran û êdî ew nikarin navberî bi dagirker re çêbikin. "Hengaw" bi rengê neteweyî hizir dike, dibe ku yekemîn rojnameya soranî be ku navê Îraqê li ser nayê nivîsandin, Başûr û bakurê welat dinivîsin, ev yek ji zû ve li nik hevalên Bakur bi cih bûye, divêt li cem me jî, wisa be û şerm be ku em bîni-vîsin û bibêjin Kurdistanê Tirkiyeyê yan Kurdistanê Iraqê û hwd. Ev yek, yekîtiya me ya coxrafi û neteweyî dide selmandin. Doza me yek doz e. Şerm e û tawan e ku kurdên Bakur di meseleya Helebçeyê û rev de bêagah bin, lê em ji Licê, Şîrnex û şewitandinê na bi sedan gund bêagah bin û haydar nebin. Tawan û rûreşî ye ku rojnameyên YNK û PDK'ê yên rojane der heqê bûyerên li Bakur de nanivîsin. Eger em rast dikin, em beşek ji gelê kurd in, 15 milyon kurd bîn çew-sandin, bîn îdamkirin, êdî çawa Tirkiye piştgiriya me dike. Çawa Îran piştgiriya me dike ku mafê herî biçûk ê neteweyî û çandî ji bo kurd pêwîst jî nabîne. Lewre gerek e em wan sînoran bişkinin û ew kesên ku wisa difikirin, em wan riswa bikin. Ku Leyla Zana hatiye girtin wekî xwişka me hatibe girtin, wisa ye ku Hatip Dicle hatiye girtin, birayê me yê mezin hatiye girtin. Dixwazim hemû kurd wisa bifikirin, ev yek jî, hêdî hêdî ber bi pêş ve diçe. Tirkiye qala tirkên Bulgarîstan û Turkmenîstane dike, di gel ku ew hem ji hev dûr in û hem jî ne yek kok in wekî me.

HEVPEYVÎN:  
SÎRWAN REHÎM



**L**i gorî saloxî û agahiyên DEM'ê û çavkaniyên xwecihî digel ku gerilayên ARGK'ê li Başûr li hemberî pêşmergeyên PDK'ê di şer de ne jî, livbaziye xwe yên li Bakur didomînin.

**AMED- 23.8.1995**

Li herêma navbera Licê û Dara Hênê (Gencê), di nav şervanên ARGK'ê û hêzên dewletê de bi dirêjîya rojekê şerekî dijwar rûda û di vî şerî de hate zanîn ku zianên mezin bi hêzên dewletê ketine. Li dûv ragihandina çavkaniyên gerilayan 6 leşker mirine, 2 gerîla û leşkerek jî birîndar bûne.

Dîsa li gundên Xanakelê û Markê ku bir ser Licê ve ne, çima ku gundiyan cerdevaniyê "erê" nakin, hêzên dewletê çavrosiyê li gundiyan dikin.

**CULEMÊRG-25.8.1995**

Li ser rîya Çelê û Serêsêvê, mayineke ku jî layê gerîla ve

hatibû çandin, dibin zîleke leşkerî de dipeqe û digel t êkçûna zîla leşkerî hate zanîn ku 6 leşker mirine û 3 jî birîndar bûne.

Her di vê rojê de hêzeke gerîla êrişî ser gundê cerdevanên Robarokê dikin. Li gorî daxuyaniyên çavkaniyên gerîla, di vê êrişê de cerdevanek t ê kuştin û 2 jî birîndar dibin.

**ÇEWLIK-23.8.1995**

Hate ragihandin ku li gundê Dimilatê, li navbera Adakli û Sancaqê di navbera gerîla û hêzên dewletê de şerekî ji serê sibê heta bi derengî ya şevê rû daye. Her çende encama zianên dewletê bi dirustî nehate zanîn jî çavkaniyên binçihê didine eşkerekirin ku, di rûdana şerê di navbera tîmên taybetî û leşkeran de 5 leşker mirine.

# Germahiya şer danakeve

Li devera Bavanê jî, piştî êrişeke gerilayan li ser sengerê hêzên dewletê, leşkerek hatiye kuştin

**PKK'ê li Başûr gelek dever bi dest xistin**

Sengerên li ser tixûb ên KT'ê ku PDK'ê diparastin, hatin valakirin.

Pêşmergeyan, êrişî ser Kampa Etrûşê kirin.

Li deverên ku şer lê berfirêh bûye, di navbera PKK'ê û kesên berbiçav û pêşrewên gundiyan de t êkilî û hevpeyvînan dest pê kir.

Rûdana şerê li navbera pêşmergeyan û Yekemîn Tugaya Brûskî ya PKK'ê her dihere tevahiya Behdînan vedigere. Her ku hêzên PKK'ê bi navdeverê de dadiçe, hêzên PDK'ê jî li navend û navçeyan

asê dibin. Li dûv ragihandina ajansa bi navê DEM'ê, di 29.8.1995'an de, ji devera Hefteînê heta bi Metînan, Li derdorê Zaxo û Dihokê, li devera Gare, ji Sersingê û Amediyê heta bi navçeyên Şêrwanê û Diyana, şer diwartir û berfirêhtir bûye.

Hate zanîn ku digel destpêkirina êrişên xwe, PKK'ê giranî daye ser xebata siyasî û bi gelê li deverê re t êkiliyên xwe danîne. Li deverên mîna Kanîmasiyê, Berêgare, Sersingê, Qedişê, E-nîçkê û Derkarê, ku berê di dest hêzên PDK'ê de bûne, hêzên PKK'ê niha li van deveran jî bo qezenckirina piştevanîyê bi gel re kombûn û hevpeyvînan dikin.

Digel rîhspî û pêşrewên 32 gundên li derdorê Sersingê,

rîhspî û pêşrewên gelek gundên Berêgare ragihandin ku ji bo rakirina çekan her çende PDK wan zorga jî dike, lê ne çekên PDK'ê radikin û ne jî piştevaniya wê dikin.

Dîsa hate zanîn ku ji bo parastina xwe pêşmerge senger û çeperên xwe yên li ser tixubî berdane. Ji aliyekî din ve PDK hêzên xwe yên ji hev belawela li navend û navçeyan kom dike. Sengerên pêşmergeyan ên li deverên Derkar, Qumrî, Qediş û Seltê hemû hatin şewitandin. Hêzên PDK'ê yên ku li hemberî gerîla xwe negirtin, vêca dixwazin hêrsa şikestina xwe ji penahendeyên Bakurî derxin. Kampa Etrûşê ya ku ji penahendeyên kurdên Bakurî pêk hatiye, pêşmergeyan PDK'ê êrişî ser wan dikin. Hate zanîn ku piştî dorpêçkirina kampê ji layê pêşmergeyan ve penahendeyên bakurî hatine gulebarankirin.

DEM/Welatê Me

## Biyanuwî parastinî sinur û helwêstî hêze siyasîyekanî kurd

**L**e rojevî bizutnewey siyasîman da û be taybetî piştî rêkewtinekey em diwaiyey nêwan Partî Dîmokratî Kurdistan (PDK) û Yekêtî Nîştîmanî Kurdistan (YNK) meseley parastinî sinurî deskird, cêgayekî firawanî le meydana giftugokan da girtuwe. Diyar e parastinî sinur ne be xwestî kurd û ne le berjewendî gelî kurdîş da ye, belam sed der sed le berjewendî û be xwestî dujminanî kurdistan e. Le em roş da ber le her dujminêkî tir, dewletî turk ew merramey kirdote biyanuyek le xwest û wistî xoy pê meyser bikat.



**Binêre Ehmedê Xanî çî delê:**

- Bifkir ji Ereb heta ve Gurcan*
- Kurmancî ye bûye sibhê bircan*
- Ev Rûm û Ecem bi wan hesar in*
- Kurmanc-i hemî li çar kenar in*
- Herdu terefan qebîlê Kurmanc*
- Bo tîrê qeza kirîne amanc*
- Goya ku li serhedan kilîd in*
- Her taîfe seddek in sedîd in*

yanû we û hîçî tir. Dena xo meseley xwastinî Musil û Kerkukîş, her le zuwe we, meseley parastinî sinur niye.

Xo hêrîş û pîlanekanî Turkiye dijî şorişekanî Başur ber li serhêdanî şorişî Bakurîş parastinî sinur nebû.

Ey xo hêrişî Osmanîyekan ber le 200 û ewende sale bo Başur û kawil-kindinî nawçeke û ru-xandinî Îmaretî Baban sinur parastin nebû.

Gelî dostan...mesele le parastinî sinur be der e û hemuşman baş le niyaz û nawerokî mebestekanyan t êdegeyin. Belam t êgeyiştin be tenha bes niye. Kê xawen helwêst e.

Dersîm wa Turkiye yan har û şêt kirduwe û 50 hezar serbazî bo xistunete şerêkî naberanberewe?

Ey le çî sinurêkewe çekdare şorişgêrekan bo l êwbazî partîzanî dege-ne çiyakanî Edene?

Ey ew hemû çalakiyane nay şarî Stanbol û mîtropolekanî tirî Turkiye çîn? Ba dawletî turk henawî daxirawî tîmar bikat, aburî datepîwî çareser bikat û karbedestekani (ke be hoy berî na le barî jîyanewe) pena we ber xokuştin deben qurtar bikat, nek biyanûy parastinî sinur le kurdan bigrêt. Pêwîst e kurdan jî be seng û qursiyekî le cê da le hemberî daxwazî turkan bewestin, dena dîrok pakaney kes qubul nakat.

Em ro hemwan baş dezanîn ke meseleke bi-

diş le nûwey yekemî em sedeyeman da, be raşkawî kurdistanêti bû, nek Iraqî, Îranî û Turkêtî. Belam êsta û be taybetî le başurî welat, meseley yekêtî xakî Iraq û parastinî sinur be corêk le alî seranî kurdewe baş dekrêt ke ne Iraq, ne Îran û ne Turkiyaş ewende be zarî siyasetyian da derbaz nabet. Diyar e em rewşe nacore karesatêkî pir derdeserî û tirsinakî fikrî le hizrînewey nîweman da çêdekate, karesatêkî wa, ke deskarîkirdinî sinur biveyekî gewre û giran bêt û îdî ta rojî nefxî sur debê ew sinurane be textî tewêlî kurdistanewe bin, wek ewey xwa le çarey nusîbêtin.

Ev ro ke le layen Turkiye we bas le parastinî sinur dekrêt û kirduyane be wêrdî ser ziman, bi-

yanuwe, biyanuyekî pir diroye û amancêkî pîsî le piştewe ye. Amancî pêknehatinî hewênî dewletêkî serbexoy kurdî, tenanet eger le başurîş bêt. Her weha amancî ne xemlandinî Hukumetî Federalî Başurî Kurdistan, ew hukumete sawey ke destkewtî raperînî gelî kurd e, keçî Suleyman Demirel her zû be dûmelî ruxsarî Rojhelatî Nawerastî naw bird. Lê belê seranî kurd le başur berdewam bûn le pênase kirdinî Turkiyey dîmukrasî û şaristanî wayan nîşan deda ke eger Iraq wekû Turkiyey dîmukrasû biwaye, ewan şorişî çekdariyan nedekird. Bem kareyan xûya debêt ke ew tawane gewre û giraney Turkiye der heq be gelî kurd kirduye û deyka, ewan boy dîze be derxone de-

ken û le kurdî deşarinewe. Tawanî ewey ke ta halî hazir Turkiye dan be bûnî neteweyekî 40 milyonî da nanê û delê; Şitêk be nawî kurd ewe niye.

Êstaş em mijarî parastinî sinurey ke turk kirduye be binêste xoşey bin didanî, gerekêti dû nîşanî pê bişkênê..Likan-dinewey Kurdistanî Başur be Iraq ewe yek, dû helgîrsandinewey şerî kurd kuji le nêwan hêzekanî Başur û Bakur da û lew bwareşewe lawaz kirdinî şorişî bakurî Kurdistan..Egîna xo em ro be tenha le ser ew sinurane çalakî çekdarî be encam nagayandrê.

Kê bû le naw cergey şarî Diyarbekir da nûsîngey hemû rojname turkiyekanî xir daxist?

Ey ewane kên û le çî sinurêkewe hatunete



**N**a nuşte xo di bingey alewiye ra zaf wazen ki roza ewreyen ser, sare dezi na rozan ser vinderî. Naye di dîrokî xo kî ame çimanî xo ver. Çi ki a waxt bo na waxt bo her dem taye sare dezi alewisyan biyo. Alewiya waxt raye xo çutir kerdî tever? Na sare dezan xo sero çutir def kerdê? Ewro sekenî? Dost dismenî xo nas kenî nekenî?

Keso ki cera ci dîrokî alewiye di niyada, vîne-no ki tima xo esto ver. Coru veri dismenanî xo di vile çewt nêkerdo, neqiyî qewul nêkerdo. Naye ra kî her dem esker amo ser, xeyle kesî xo na cengan di ame kiştene. Sukan ra dîr vînetî, kowanî berzan xo ri mekan gurefî. Ebi o hal ame roza ewreyen.

Baweriyî mi na wo ki, keso ki alewiye ser dîrokî înan ser vindone, gereki veri cumhuriyet bi cumhuriyet ra dim ciya ciya bicero xo ver.

Alewî kî qali zilm kerd, veri cuy, Yavuz Sultan Selim, dima ki (alewiye kurd) sarewedardayena Qoçgirî û Dêrsîm ane ra zu. Waxto ki barkerdena Kurdistan ser Yavuz Selim bi Şah İsmail amey têver kurd welatî xo ser nî biy di letey werde dismenanî xo di ca guret, jumîn di daypêro. Yane welatî xo ri wayîr nîvecyay peşkeşî dismenanî xo kerd. Osmanijan hata waxti Yavuz Selim wazenî ki ebi Bektaşiyen axme bi şaranî bînan ebi Bektaşiyê bicerî bandira xo. Ewro zanîno taye şarî Balkan hona ewro kî bektaşiyî. Onca Yenîçeriyî kî name Bektaşiyey ra ardî pêser. Zanîno destî nînan ra şarî bînan ardî qir kerdene. Yavuz Selim na rayzanî ca verdano. Niyada ki misilmanî je de suniye ser şonî, o kî rayzanî xo vurna. Wast ki aye ra dim ebi suniye axme bî. Naye wast Kurdistan bicero bandira osmanijan. Şah İsmail kî tal nîvînet, o kî wast ki Kurdistan bicero bandira xo. Mordemanî xo rusna werde alewiyan. A waxt alewiye post day Şah İsmail. Aşîrî kurdan ra taye bîn ki destî İdrîsî Bîtlîsî ra post day Yavuz Selim, Yavuz Selim veri cuy cera ra alewiyan ser. O çax xeyle alewiye kurd bi tirk amey qirkerdene. Aye ra dim kî eskerî osmanijan bi safewiyan amey Têver. Şarê kurd kî bîvi di letey wer-

te înan di ca guret bî. No ceng di osmanijan kewt ser. Xeyle alewiye kurd bi tirk koçî İran kerd. Taye xo baweriyî xo ca verda hen xo xelasna. Xeyle keşî xo kî kowanî xo di mendî. Aye ra dim kî werde alewiyan bi osmanijan qe rind nêbeno. Onca werde kurdan di dismenêna pîli naye di

riyay. West ki aşîrî Dêrsîm jubî, welat ser pêrodî.

Naye di dewlete ki tal nêvindena. Ebi risvetan, onca dismenêna ki werde aşîran di esta înan ra bo taye aşîran hetî xo ser oncena. Taye aşîrî bîn kî serekêna Seyîd Rizay di qese xo kenî ju çek gîrdanî tufang erzene dew-

vêsnay. Nêverday ki mezele nasîvi ci bo. Çi ki vate bona tûrbe. Hora keso ki mendo pêrîni rusnay xerv, axme werde tirkan kerd. Hen bî ki -way biray, may- pîy ya jumîn rind kerd vînd, ya kî ebi seran jumînî nêdiy. Peye cuy ki ef vet, xeyle kes cera ra şî welatî xo. Ci ra taye niyada ki

Badi ki Tirkiya di werde sosyalîstan û dewlete di taye buyer dest na pi ra, sosyalîstî ebi zafey alewiyan niyan di ca bî. Alewiye xeyle dest est sosyalîstan, post day ci. Çi hêf ki sosyalîstan ser xeyle kelî jî kemalîstan est bî. Keş ki qali kurdan kerdenî, desinde Enternasyanalen ardene ra zu.

zafey xortê xo axme bî. Welatê xo ra peray şîy dugelanê bînan û sukanî tirkan. Hen bî ki taye korim bî domanan ra zûv kes nêmend. Na niya ki o waxt caye bîn Kurdistan di bo Tirkiya di bo zilma nêdiyî. Onca no kî zanîno werde alewiyan û kurdî bînan di xeyle welatperwer est bî. Zilma ki ardîsare nînan ser, xoverodayîna xo kî onca zanîno.

Nayer ra dim kî 1984 di, Kurdistan di serawedardayena PKK dest napik na. Dewleta tirk roz be roz kewt teng. Çi ki aye ra ver sayiya taye hemkaran ra xeyle kurdê şafî ra post diyîni. Kelîjî hemkaran û dewlete roz be roz nînan ser bî kêm. Onca kurdê alewîkî her kî şî kurdêna xo ri veciyay. Dewlete naye ra xof kerd. Veri cuy kurd bi tirk bi tedi xo ver di disme giretenî. Ekî kewt teng west ki alewiyan ra post bîvînao û alewiye kurdan kî na serawedardayene ra kî dîrfiyo. Xo ra tima qeyret kerdene ki werde alewiye kurdan di xoperestêna tirk axmekero. Tima ardene ra zu vateni "tirkî raştiken şimayî" Ju kî hate na nejdî, bingey alewiye, dîrokî alewiye ser kes rinda rind nîvînet bî. Alewiye ser çond pîrtuk kî ameybî nuştene ya zanîngehî nêbî, ya kî mordemanî dewlete nuştîbî. Nî pîrtukî nînan ramanî dewlete ser bî. Keso kî wastene alewiye ser wayîrî zaney xo na pîrtukan dênî wendene. Zûvna kî Destî alewiyan dike hên pîrtukî zanîngehî çine bî.

1980 ra dim kî alewiye kurd bî axme şî dugelî bînan cir ra taye ramani sosyalîstey ca verday alewiye xo ri wayîr veciyay, Ci ra taye zere wes ra şî taye xo kî sanay riyî xo ver sosyalîstan ra, welatperweran ra dîr vinderî. Hete ra kî serawedardayena kurd biyîni berz naye di tekîliyî kurdên alewiye, tirkên alewiye ser qal ame ra. Taye kes va "Alewiye pêro tirkî" ramanî dewleten ser şî. Taye xo kî "Alewiye beweriyo kurd, tirk, ereb, arnavut... hona taye şarê bînan ra keş na bawerî qewul kerdo! keso ki hesaro, kurdana xo ri ki sanay riyê xo ki wayîr veciya. Xeyle keş ki çîqaş kî kurdêna xo re bêxever niyî onca kî sanay riyî xo ver ki dîr vinderî.

Dumahîk heye  
H. ANAVAR



## Alewiye ser

(1)

têra bena. A roz bo na roz bo ci ra xeyle zirar diy.

Hervi cîhanî 1. ra dim ki osmanijan kewt bini destan, Mustafa Kemal wazeno ki eskerî du gelan tever kero. Naye di xerv di nêmaneno yeno werde kurdan. Wazeno ki înan ra post bîvîno. Heti Dergahê Haci Bektaş ser ki şono. Taye nînan post day M. Kemal no rind zanîna kurdê Qoçgirî û Dêrsîm ebi zafey post ci nêda. Onca taye kurdi alewî bi şafîye dorme taye komelan di amey pêser. Hukmatiy Ankara mecal nînan nêdan. Nînan ra taye day kistene, tay kî amey guretene. O çax Alîşer Efendî bi Nurî Dêrsîmî kî dome na komelan di benî. Veri cuy Qoçgirî di xo serîna kurd ser tufang est dewlete, hukmatî Ankara a waxt taye pîlî aşîran ebi wekîlen hona taye menfaatî bînan ra hetî xo ser ont. Taye aşîrî Dêrsîm post day Qoçgirî. Ci ra taye ki arîkari ci nêbî. Qoçgirî xeyle xo est ver. Qosenîna kurd ser ebi hazaran şehîd day. Naye di dewleta tirk ewt ser. O çax Alîşer Efendî bi Nurî Dêrsîmî, Dêrsîm ser şî. Leye Seyîd Rizay di xo serîna Kurdistan ser gu-

lete. Xeyle xo erzenî ver danêpêro. Nî aşîran ra taye tesmîl benî. Serekî sarewedardayene destî mîlîsan ra yenî kistene. Alîşer Efendî, Sahana Axa... Hora pošta şarî Dêrsîmî Nî xayîn şikayenî. Keso ki eşîrî kî benî teslîm yan kî kune ra dest, pêro yenî sîrgî kerdene, Yan kî sanenî gula mîtralyozan ver. Dest

**O çax Alîşer Efendî bi Nurî Dêrsîmî kî dome na komelan di benî. Veri cuy Qoçgirî di xo serîna kurd ser tufang est dewlete, hukmatî Ankara a waxt taye pîlî aşîran ebi wekîlen hona taye menfaatî bînan ra hetî xo ser ont. Taye aşîrî Dêrsîm post day Qoçgirî.**

erzenî namusi cîniyan. Çeney cîniy xo kemeran ra erzenî onca domananî xo, xo dest ra kemeran ra erzenî, yan kî erzenî çemî Munzir. Nêwazeni ki dismen dest kuyî. Zilma henenî anî sare seri kirmanc kî belka riyî na dîna di senik ama diyayene. Ebi des hazaran kes amey qirkerdene. Meyîfî înan tîja amonî vera po-yayî. Lopi di lopi wele ser estene nasîvi keş nêbî. Seyîd Rizay bi hevalan kî kewt dest, pêrî-nî est dar meyîfî înan kî

dewî xo vêse, bêçare mend ceray ra xerv.

Naye radim kî dewanî Dêrsîm di mekebanî xo kerd ra. Hema hema de-wa bêmekteb nêmend. Onca sukî ki dewe ki ebi sixletiyî alewiye, zor day mekteban. Domanî alewiyan na mekteban di zonê xo ra, çandê xo ra je vatena xo day wendene. Gerek şarê Dêrsîm bo a-

erzenî namusi cîniyan. Çeney cîniy xo kemeran ra erzenî onca domananî xo, xo dest ra kemeran ra erzenî, yan kî erzenî çemî Munzir. Nêwazeni ki dismen dest kuyî. Zilma henenî anî sare seri kirmanc kî belka riyî na dîna di senik ama diyayene. Ebi des hazaran kes amey qirkerdene. Meyîfî înan tîja amonî vera po-yayî. Lopi di lopi wele ser estene nasîvi keş nêbî. Seyîd Rizay bi hevalan kî kewt dest, pêrî-nî est dar meyîfî înan kî

lewiye caye bînan bî, en dirbete xorf naye di guret. No azo ki mektebanî tirkan di day wendene, zonê xo ra, çandê xo ra, şarê xo ra birnay ra. Nî werde şarê xo di ramani kemalîstan axeme kerd. Tima qali laîkan kerd, na dewlete şarçim di laîk musnay. Dewlete hete ra post da tarîqatan, hetex ra kî vake "Ya dewlete yan kî nî tarîqat". Ebi nînan ters day alewiyan. Hen bî ki xeyle keş kelîjî na qesan di mend. Dismenî xo ri bî qul. Ebi na hal xeyle ranit.

Xo serîna Kurdistan rinda rind nas nêkerdenî. Hora keso ki xoserîna kurd wastene o kes, yan kî komel neteweperest name kerdenî. Heman hema o kes xo ver di disme say kerdenî. A waxt kelîjî nî sosyalîstî tirkan alewiye Kurd sero xeyle est bî. Xeyle alewiye kurd leye nînan di depêro xo estver. Taye amey kistene, taye xo amey guretene zindanan di mednî. Onca zone tirkî naye di werde alewiye kurdan di rinda rind axme bî, şî rest dewan. Hen bî ki xortî kî amey kistene heşyan keş nîame ki nînan dima di çeku zonê xo ra şîwareyî vazo. Bivaj ki azo newe werde 1970 û 1980 di çandi xo ra her kî şî kewt dîr. Şarê xo, çandê xo, xo çima di qiz dî. Ebi na hal hata 1980 ramit.



## Diyaloga Sokrates, Ehmedê Xanî, Rewşenbîr û Serok (3)

## GILÎ Û GAZIN

**SOKRATES:** Serokê birêz, va ye Ehmedê Xanî li vê derê ye. Em dikarin ji wî hin pirsan li ser wêje û hwd. bikin; ew jî bi zanebûna xwe ya giran û birûmet, bi bersivên xwe me ronî bike.

**SEROK:** Rast e. Fermo dest pê bike, çi dixwazî pirs bike!

**SOKRATES:** Birêz Ehmedê Xanî, kurê gelê leheng, hozanê sedsalan ku nemir, tu ji me re li ser rewşa wêjeya kurdî ya nûjen çi dikarî bibêjî?

**EHMEDÊ XANÎ:**

*Li min fedî ye ev pesn û rûmet  
Li pêş mirovên zana û qewet  
Hîn zû ye gotin li ser demwêje  
Wêjeya nûjen pêş û dirêj e.*

**SOKRATES:** Rast e, hîn bişkuvên wêjeya nûjen dest bi hebûnê nekirine, lê tu li ser pêşerojê çi difikirî? Gelo wê kengê çosa nivîs bi mistewa bilind xwe ronî bike?

**EHMEDÊ XANÎ:**

*Berî her tiştî pêwîst bû tacek  
Da ku bi kesî nebe muhtacek  
Ji bo kurd nebin bindestên timî  
Ji xwe re deynin bingehêk hîmî  
Ziman û wêje zû dibin ronî  
Ger mirov bingeh bo welat danî  
Pêşketin û pêşveçûn û nûjenî  
Dest pê dike bi vê cewherî*

**REWŞENBÎR:** Ya rastî ez ne pirsên Sokrates ne jî birsivên Birêz Ehmedê Xanî tê nagihîjim, ji kema xwe, re hûn dikarin mebesta xwe hîn zelaltir bînin zimên?

**SOKRATES:** Baş e. Tu çi kar dikî, pişeya te çi ye Birêz Rewşenbîr?

**REWŞENBÎR:** Min ilmên felsefe û sosyolojî xwendiyê, niha jî li ser Ehmedê Xanî û helbestên wî dixwazim doktora çêkim.

**SOKRATES:** Tu pirsên min ji bo te neman, bersivên ez bidim te Birêz Rewşenbîr ji kok hîç nîn e.

**SEROK:** Te felsefe xwendiyê, baş e. Tu Sokrates dinasî?

**REWŞENBÎR:** Belê filozofekî Yewnanî ye.

**SEROK:** Xwe li ser çi beşî kar kiriye, di kîjan demê de jiyaye û çawa têkoşîn daye?

**REWŞENBÎR:** Bawer im, pir kevn e, min hîç berhemên Birêz Sokrates nexwendiyê.

**SOKRATES:** Berhemên min nîn in.

**REWŞENBÎR:** Çawa? Navê te çima li ser hemû filozofan e?

**EHMEDÊ XANÎ:**

*Va ye rewşa me, tac û filozof  
Bizanîn çima wêje paş û qof  
Lê, hêviya min ew dem ne dâr e  
Ronahiya nûjendem ji pir kûr e.*

**SOKRATES:** Li ser wêje pirsên min neman.

**REWŞENBÎR:** Ma, ka tu bersiv jî nehatin. Eger hûn rê bidin ez dixwazim hin pirsan ronî bikim, ka çima wêjeya kurdî ew qas li paş maye, an jî bi pêş ve naçe..

**SOKRATES:** Ez bawer im, Birêz Ehmedê Xanî bersiva min bi kurta hî da, lê tu dikarî dîsa jî ramana xwe ji me re bî-nî zimên, da ku em hîn jî, ronîtir bibin.

**REWŞENBÎR:** Sedema pêşneketina ziman û wêjeya kurdî ew e ku tu îmkân di destên kurdan de, bi taybetî jî, di destê nivîskar û rewşenbîran de tune bûye..

**SOKRATES:** Te bêîmkân zanîngeh tewa kir?

**REWŞENBÎR:** Hûn zanin hin taybetiyên nivîskar û rewşenbîran hene, divê mirov wan bide ber çav. Lê di me kurdan de kes rûmeta nivîskar û rewşenbîran nizan.

**SOKRATES:** Ne te got der-

ne dimîne. Derfet ji bo kesên bixwazin tiştan bikin, hene. Derfet ew kes bi xwe ne. Nivîskar bi xwe nikaribe biafirîne, tu derfetan giş bixî xizmeta wî jî, nikare. Filozof ji bo ku felsefe bike, li gorî min pêwîstiya wî bi tu derfetan jî, nîn e.

**SEROK:** Birêz Sokrates, tu hîn rewşenbîrên me baş nas nakî. Piranî tînan qala derfetan dikin, em bi giş derfetan xwe dixin xizmeta wan lê dîsa jî gava ji çav wî dibin, ji bîr dikin. Wekî din we pir baş anî ziman, bi gotina ku derfet tu rêyên mezin ji afirandinan re venake. Divê di mirov de, di mejûyê mirov de teqandin çêbin. Yekî nikaribe mejûyê xwe mîna volkanan pêk bîne, bi agirên mejûyê xwe ronahiyên mîna rojê biberiqîne, di destê wî de ji gilî û gazin bêtir tu tişt namînin.

**SOKRATES:** Te pir xweş anî ziman, tam ji dil û hişê min...

**SEROK:** Tu çi diponijî, birêz Nalsrazob?

**NALSRAZOB:** Ez çi bêjim. Tu dibêjî qey hin tişt ji min re jî ronî dibin, lê birastî ez pê re nagihîjim ku rewşa xwe li vê anegorê zelal bikim..

**SOKRATES:** Eger te dest bi şikê kiribe baş e Mîrze Nalsrazob

**REWŞENBÎR:** Ez nizanîm ev Nalsrazob çima dest bi şikê kiriye, ji bo çi? Ez tînanagihîjim Ehmedê Xanî çi dibêje, Sokrates dibêje ku berhemên wî tun in. Ew çawa ewqas bi nav û deng bûye, ezê ji kê bipirsim. Wê kî bikaribe bersivên min bide.

**SOKRATES:** Tu dest bi pirsan bikî, wê rojek bê tî bikaribî bersivan jî, doz bikî? Tiştê baş ew e ku mirov her tim pirs bi pirse. Bi pirsan mirov dikare ronî û zelalî bibîne. Divê mirov hîç nebêje ez zanim, mirov çiqas zanibe, ewqas nezan e. Mirovên herî bi aqil ew e; ew zane ku tiştê

**SOKRATES:** Ez bawer im.  
**SEROK:** Tu bi çi bawerî?  
**SOKRATES:** Ez bi hêza we bawer im, ez bi rewşenbîrên kurd bawer im. Ev çekê hûn didin destê wan ne biçûk e; wê rojekê bikaribin pêk bînin.

**SEROK:** Birêz Ehmedê Xanî, tacê helbestvanan, filozofên gelperwer hûn çi difikirin?

**EHMEDÊ XANÎ:**

*Her wiha berdeuam be serkeftin  
Salên pêş me, êdî kurd ne bindest in*

*Afirandina ziman, wêje û dewlet  
Girêda ye bi serxwebûn siyaset*

**SOKRATES:** Ehmedê Xanî filozofekî, zanayekî, wêjeyanekî berz e.

**SEROK:** Belê em dixwazin di dema me de jî, Ehmedê Xanî derkevin.

**SOKRATES:** Ji ber vê yekê hûn pir zor didin rewşenbîran, nivîskarên.

**SEROK:** Belê eger me zor nedabûya gerîla tîrsa kurdan ne dişkiya. Ma kurdên feqîr û belengaz dikaribûn rabin ser xwe û bala dinyê bikşînin ser pîrsgirêka xwe? Ma wekî din kurd dikaribûn xwe bikin bombe û biteqînin. Ev rewş ji

bo her beşê civakê derbas dibe. Mirov zor nede, zayîn çênabe, zor pîrika zayînê ye pir caran..

**SOKRATES:** Tu jî, mîna min pîrikî dikî, ji kesên ducan re, ne? Diya min bi xwe pîrikî bû û jinên ducan dida zayînê. Ez jî ji wê pêşeyê fêrbûm ku mirov zayîn çawa dida çêkirinê. Eger ez ji mirovek re dest bi axiftinê bikim, metodên pîrikî pêk tînim, bi vî awayî kesên herî nezan jî, gelek tiştên zana dizên..

**SEROK:** Mirov dikare piçek bide ber hev, lê karê min hîn jî, diwartir e. Pir caran dergûş hîn di rihma diya xwe de ne tendurust in, divê ez dergûşa berî zayînê jî, derman bikim ku tendurist bizên.

**SOKRATES:** Belê, ez baş tîdigihîjim. Lê diya min nikaribû di zikê dayê de zarokan derman bike..

**SEROK:** Lê hûn dikarin Sokrates. Ez zanim hûn dikarin. Tê bîra min we çawa ramanên hin şagirtên xwe hîn ku nehatibûn ziman, bi pirsên xwe rast dikir.

**SOKRATES:** Lê ez dibînim rêya we gelek serkeftî ye. Ya me tenê raman û axaftin bû ya we zor e, ji ber ku hûn jiyane jî, diguherînin.

A. YEZDAN



fet tune. Eger derfet tune û we tiştê nekiriye, hûn dikarin bikevin kategoriya nivîskarên?

**REWŞENBÎR:** Çima? Ma derfet hebûn ez nebûm nivîskarekî, filozofekî mezin?

**SOKRATES:** Tu ji kî, bi çi awayî alîkarî dixwazî? Te bi awayekî anî ziman ku wêjeyan, filozof û hwd. yên mezin ji ber bêderfetiye çênebûne..

**REWŞENBÎR:** Belê.

**SOKRATES:** Tiştê çênebûbe, mirov dikare rûmeta wî bigre, alîkarî bike, an jî jê re derfetan pêşkêş bike?

**REWŞENBÎR:** Na, nikare.

**SOKRATES:** Wê demê gotina ku derfet nîn in jî, bê ma-

**SEROK:** Rewşa nivîskar û rewşenbîrên me yê wê demê gilî û gazin e.

**EHMEDÊ XANÎ:**

*Heyhat ev derfet îro bo kurdan  
Dîrokê binêr talan û tofan  
Ev rabûn û serhildan  
Ev zanistî û berxwedan  
Yekemîn car e ji bo Kurdistan  
Ji bo Kurdistan wek baxça gulên*

**REWŞENBÎR:** Nizanîm hûn hemû qala çi dikin? Tu dibêjî qey Kurdistan serfiraz bûye, tenê ez pê nizanîm..

**SOKRATES:** Rast e, te baş got. Kurd tîrsê tîrsandinê, giyana xwe ji qirêjiyê paqij dikin. Kesek îro bixwaze kurdan fêm bike, pêwîst e bi metodên berê xwe ne livîne.

nizane.

**REWŞENBÎR:** Ez te hîç fêm nakim birêz Sokrates. Ez ne te, ne birêz Serok, ne jî birêz Ehmedê Xanî, hîç yekî ji we fêm nakim. Ez êdî birêz Nalsrazob jî fêm nakim. Ez hîç tiştêkî nizanîm..

**SEROK:** Belkî cara ewil e ku te gotinek rast got. Baş e, emê hevdu hêdî hêdî fêm bikin. Zanistiya herî mezin ew e ku mirov xwe mezin nebîne, xwe zana nebîne. Eger mirov zana be bi zanistiya xwe li pêş çav e, ne bi pesna zanistiya xwe. Birêz Sokrates, emê bikaribin bi rewşenbîrên nûjen serkeftineke çandî, hunerî pêk bînin an na?



# Awireke dîrokî li ser şanoyê

Tiyatro, gotineke grêkî ye ku tê wateya lîstikgehê. Di binhegeha xwe de ji peyva "theatron" tê. Kurdiya vê peyvê şanogeh anku nîgargeh e. Heger mirov bi çavekî dîrokî lê mêze bike, hingê navê Grêka kevin tête ser zimanê mirov.

Şano bîngeha xwe ji olperesiyê digire. Ew li ser stiran, govend û kevneşopiyê ava bûye. Lê geşbûna wê di sala 400 BZ. de dest pê dike. Wekî me li jorê jî got; şanoya grêkî li ser kevneşopû çîrokên devkî zaye û bîngeha xwe, ji şanoya rojavayî digire.

Herwisa dihate zanîn ku, şano, di koşk û qesrên şah û mîran de û li kolan û meydanan dihat leyîstandin. Mirov diçûn wir ji bo ku wextên xwe bi kêf û henekan derbas bikin. Lîstikvanên şanoyê, gelşên civakî diannî zimên.

## Dema kevnare û nû

Dîroka şanoyê derbasî 2500 salî dibe. Ew, hunera dema hînî me dike. Şanoya dema navîn, bi tîkçûna împatoriya Romê ve dawî lê hat, lê ji nû ve za. Ev zayîna di sala 1400 PZ. (1300-1500) de çêbû. Di dema navîn de, şano li ser naveroka încîlê ava bûye.

## Dramatika Grêkî

Dramatika grêkî di nav xwe de dibe du beş, ew her du beş jî ev in:

Trajedî û komedî. Gava mirov bixwaze behsa dramatikê bike, çend nav tene ser zimanê mirov ew nav jî ev in: Aîskîlos, Sofokles, Eurîpîdes û Aristofanês.

Aîskîlos avakar û hîmdarê trajediyê ye. Ew nivîskarekî bi navûdeng e. Temaya berhemên wî, li ser nakokî û xirûcîriya navbera mirovan û yezdanan e; bîngeha çîroka xwe ya bi navê "Orestiyê" li ser çîroka Homerosî ya bi navê "Odisseyê" avakiriyê.

Şanoya romî ne li ser olperesiyê, lê li ser bîngeha hunermendiya grêkî û helenî ava bûye. Nivîskarên herî navdar Plautus û Terentius in, ku navê wan derbasî dîrokê bûye. Di sala 1400 PZ. (1400-1500) î de, rewşeke çêtir hat pêş, heweskariya şanogêrî ya îtalî bi pêş ket; li wir berhema herî navdar hate nivîsandin. Navê wê "Commedia dell'arte" ye. Ew şanoya gelêrî bû. Paşê li ser vê bîngehê dramatika elîsabetiyê li Brîtanya Mezin, sernavê Marlowe û Shakespeareyî û her wisan jî li Spanyayê bi sernavê Calderon û Lope de Vega..

Drameyên Shakespeareyî, di nav xwe de dibûn çar bir (kom) ew jî



William Shakespeare

ev in:

- 1-Dramên dîrokî.
- 2-Komedî.
- 3-Çîrok.
- 4-Tragedî.

Corneille û Rasîne hîmê şanoya klasîk (frank-klasîsîtîsk) danîn û di sala 1600' de mîra xwe li dîroka şanoya cîhanê xistin. Klasîkerên Fransayê berhemên xwe li gorî teqlîd û edîbê şairên grêkî dikirin. Ew şert û qaîdeyên wan, ev bûn:

- 1.Wext-li girî demê.
- 2.Hevgirêdana lêhûrbûnê, hildestkirin.
- 3.Cih û war, şûn-li cih û şûnê.

Her çiqas navê Corneille û Resînî hat gotin jî hîmdarê Klasîkerê Fransayê Boileau ye. Ew ji bo rêvekirina li kesa li ser peyvên jêrî radiweste.

- 1.Tehemul (temul)

- 2.Rasteqînî
- 3.Xwezayî
- 4.Formxweşî
- 5.Ronahîkirin

## Çand nivîskar û berhenên wan

Trajedî (afirandinên şanoyî yê dilpêşewate)  
Aîskîlos: Orestîen  
Sofokles: Key Oyidîpus (400 sal bz.)  
Eurîpîdes: Mediya (li der û dora 450 sal bz.)

## Komedî:

Aristofanes: Teyr (li der û dora 420 sal bz.)  
Menardros: Komedîya sermiyandariyê (300 sal bz.)  
Shakespeare: Hamlet (1603, Brîtaniya Mezin), Remeo û Juliet,  
Molîere: Tartuffe (1664,Fransa)  
Holberg: Jîp li Çiyê (1772, Danmark)  
Gogol: Revîsor.(18-36, Rusya)

Îbsen: Bûkmal (18-79, Norveç)

Strindberg: Xanima Julie, (1888, Swêd)

Tjechov: Çûka masîgir (1896, Rûsya)


**Têbinî:** Min ev têbinîyên li ser dîroka şanoyê ji çavkaniyên swêdî girtine; ew çavkanî ev in:

- 1.Bonniers stora T.
- 2.Reflex, Natur och kultur, det moderna uppslagsverket.
- 3.Berkers Varldshistoria omarbetad och till vara daggar fortsatt av Prof. W. Muller.

MARUF YILMAZ

# DEFTER

## MED TV



AMED TIGRÎS

Wekî ku tê zanîn, ji 12'ê meha avrêlê bi vir ve Med TV ketiye nav çapemeniya kurdan. Bi Med TV re çapemeniya kurdan pêngava herî mezin û girîng avêt. Her wiha Med TV pênc mehên xwe yê weşanî tijî kirin. Di van pênc mehan de çi bû û çi nebû? Mirov dikare li pey xwe vegere û çavekî li programên wê bigerîne. Baş û nebaş bide ber hev. Ji bo ku nebaşî kêmbibin, divê mirov pêşniyaz, daxwaz, rexneyên xwe bi nivîsin û bi devkî bibêje. Pişt re jî bi her awayî alîkarî û piştgiriya Med TV bike.

Heta niha li ser Med TV bi çend zimanî çend nivîs hatine nivîsandin. Hin ji wan kurdan bi xwe nivîsandine. Piraniya nivîsên kurdan pozîtîv bûn. Yek-du yê negatîv jî hebûn. Min bi xwe bi riya telefonê hin tişt ji berpirsyarê Med TV re gotibûn.

Berpirsyarê Med TV dibêjin ku "Bêhtir rexne û pêşniyazî ji Swêdê ji me re tî. Bi taybetî rojên ku piranî an jî giraniya programan bi tirkî bin, kurdên li Swêdê telefonên me meşxul dikin. Niha me haletê daniye. Dema telefon tî, em li wê haletê mêze dikin, haletê koda welatan dinivîsîne, heger koda Swêdê be, em ranahlêin telefonê. Kurdên Swêdê em gêj kirin. Ji bo çewt-nivîsandina tîpekê (herfekê) jî telefon dikin û dibêjin we çima ew tîp çewt nivîsandîye?"

Divê hevalên navenda televîzyonê, bi rexne û pêşniyazan neêşin û aciz nebin. Bi ser re jî dilşah û dilgeş bibin ku gel li televîzyona xwe xwedî derdikeve. Bi baldarî lê temaşê dike û dixwaze ku televîzyona wan jî baş û bi qelîte be. Ev ji bo wan hevalên ku programan çêdikin,

dibe zixt ku baştir berheman biafirînin û pêşkêş bikin.

Divê programên bi zimanê kurdî û yê tirkî jî hevdu bî qetandin. Bila her beş cihê cihê be. Di vekirin, pêşkêşkirina programan û di girtinê de spîker hebin.

"Dengûbas" nivî bi kurdî ye. "Deng" bi kurdî ye û "bas" jî bi erebî ye. Kurdiya wê "nûçe" ye. Yanî tiştên ku "nû" çêbûne." Her wiha di nav gel de jî belav bûye û tê zanîn. Nûçe pêwîst e ku bi kurdî bin û bi kurdî bî pêşkêşkirin. Heta niha nûçe rasterast wergêra tirkî bûne. Kes ji kurdiya wê baş fêhm nake. Bi tirkî difikirin û bi kurdiya wê dinivîsin.

Gotinên çewt û ne di cih de bi kar tînin. Wekî; binçavkirin, cerdevan, jiyana dibin, ragihandin, livbazî, pîkolî, hozan, dorpêçanî û hwd... Paş pirtikê zêde tînin dawîya lêkerê wekî: Hûn ji ku telefon dikin (ê), hûn Med TV temaşê dikin (ê)... Tekstên ku dinivîsin, ji aliyê rêzimanî ve çewt in. Heta navên program û kesa çewt dinivîsin.

Dengbêj û hunermendên Hunerkomê bêguman kesên hêja û birûmet in. Fedekar in û keda wan di vê şoreşê de heye. Lê, heger ew wiha di her programê de hebin, ez bawer im ku ew temaşevanên ku bêhtir ji deng û hunerên wan hez dikin jî, dê ji wan sar bibin û di demeke nêzik de, kes dê temaşê û guhdariya wan neke. Di warê çand, huner, muzîk û folklorê de pirrengî û pirdengî pêwîst e.

## BAŞAK KANAT

Tu guman neke, kulîlka min a azadiyê, Gunehkariya mirovahiyê Tenha dijminên mirovahiyê dikin. Mij û moran, Nikarin bibin asteng li pêşiya ronahiyê. Tu, mirova ciwan û payebilind, evîndara azadiyê. Tu, keça kurd a birûmet, perestgeha mirovahiyê.

Mirin çenda kirêt dibe bila bibe, di 29'ê hemû tebaxan de, bi wê gîrnîjîna xwe ya germik û sermedî, di hijdehê xwe de derxikek, tu dê her di bîra me de, di dilê me de her wekî xwe bimînî.

Dayika wê Şahhanîm Kanat  
Xwişka wê Edibe Şahin



Di tarîka şevê de,  
Gava ku stêrek şemîtî  
ji asmanan  
Gava ku derxikek şikest  
li qeraxê Munzûr  
Dibe janneke tenik û nazdar  
li Mezopotamyayê.



# PÎR Û ROVÎ

Zarokino, li dinyayê pir xeta û sûc hene ku mirov dikare bibexşîne; le sûcek heye ku kî dibe bila bibe, dema vê yekê bike mirov wî nabexşîne. Belê zarokino, dizî tiştêkî pir xerab e. Li dinyayê berî her tiştî gere mirov qedrê ked û xebatê bizanibe, ji berê heya niha ev şerê di navbera mirovan de ji ber vê yekê ye jî. Kedxwar dixwazin, cotkar, karker û kedkaran wekî koleyan bixebitînin û ew jî da karibin bixwin û vexwin. Kedkar li her deverê dinyayê li dijî vê dizîya gemar derdikevin û dixwazin ku kedxwar keda wan nedizin û ew jî wekî wan kar bikin û bi keda xwe bijîn. Zarokên delal, hûn bibêjin kî neheq û kî heqdar e di vî şerê şoreşa wekhevîyê de?

Ca bifikirin, mirov bi çî zehmet û kedî dibe xwediye tiştêkî û bi hêviyê mezîni li benda wî tiştî ye û tu dinêrî ku ev tişt hatiye dizîn. Wê demê ewê ku ev diziyê kiribe, bi destê we bikeve ez bawer im hûnê wî mirovî gelekî biêşînin an bi lêdanî an bi gotinên xerab. Zarokino, mirov ji bo dizîna tiştêkî biçûk ewqas bêhteng



dibe û dikeribe, lê binêrin welatên kurdan hatiye dizîn û hin jî hinek kurd bédeng û bêxem in, bi rastî mirov nizane ku ji mirovên wisa re çî bibêje. Kesê ku li dijî dizîna welatê xwe bédeng dimîne, ez bawer im ji taybetiyên mirovî bêpar in. Tirşik xwarineke tevlihev e, tê de her sebze heye û tama wan li hev ketiye û mirov nikare bibêje ku ev xwarin bi tene tama fîlañ sebzeyî ye. Mirovên li dijî dizîna welatê xwe bê deng in jî wekî vê xwarinê tevlihev in û nasnamaye wan nîn e; em dikarin ji wan re bibêjin tirşik.

Îro dizên welatê me kifş in û eşkere ne, lê ew, ewqas bêar û bênamûs in ku dev ji vê rewşa xwe bernadin. Çîrokek li Kurdistanê tê gotin, bi rastî derseke pir xweş dide mirovên diz. Min ev çîrok ji bo wê zarokên delal û hêja kir wekî stran û ezê peşkeşî we bikim. Binêrin çî tê serê rovî û di dawiyê de ew jî fêr dibe ku dizî tiştêkî pir ne baş e û tohbe dike ku ew careke din diziyê neke.

**PÎR Û ROVÎ**  
Hebû tune bû  
pîr û bizineke wê hebûye

her roj didoşe bizinê şîr dike elbê, dike bin sîtilê pîr mêze dike roj bi roj şîrê wê kêr dibe digire dasê destê xwe û xwe vedişêre li paş derî. Rovî hîn bûye her roj tê şîr bi kêf vedixwe rovî diçe ser elba şîr pîr bi dasê poçika wî jê dike rovî direve diçe nav hevalên xwe hevalê vî lê dinêrin poçika wî tu neye ha hahaha... Kolo kopo, kolo kopo ka poçika te? Rovî pir şerm dike, lava pîrê dike:

pîrê min kir tu neke, ka poçika min bide.  
Pîrê: Here şîrê min bîne ezê poçika te bidim.  
Rovî dihere ji bizinê şîr dixwaze,  
bizin dibê: Ji min re çilo bîne.  
Tê ji çilo pelên wê dixwaze Çilo: dibê ji min re avê bîne.  
Lava kaniyê dike dibê: Hinek av bide min bireqise.  
Kanî dibê: Bila qîza paşê were ser min ezê avê bidim te.  
Rovî lava kîza paşê dike, dibê: Were ser kaniyê.  
Qîza paşê tê ser kaniyê, kanî av dide rovî rovî avê dide çilo, dar pelê xwe dide rovî bizin çilo têr dixwe, û şîrê xwe dide rovî rovî şîr dide pîrê, pîr poçika wî didê rovî diçe nava hevalên xwe, bi kêf wan re dilêyîze rovî dibê min guhdar kin, min soz daye pîrê êdî keda kesî nadizim. ha hahaha... rovî êdî tohbe kiriye, çî baş e hevalino

**Çîrok: Gelêrî  
Gotin û muzîk:  
ROTÎNDA YETKÎNER**

## D Î T Î N Û R A M A N

### Kurd 12 salî ne

Wê rojê min Med TV temaşe dikir, bi navê "Roj Baş Mamoste" mamosteyê hêja û delal Amed Tîgrîs ders dida gelê kurd ê ku ji welatê xwe koç bûne û çûne Evrûpayê. Tiştê ku gelekî bala min kişand ev bû: Xwendekarê mamoste Tîgrîs hinek ji wan 15 salî, hinek 20, 30, 40 û emrê hinekan ji wan çûbû 60, 70 salan. Min li wan guhdarî dikir. Bi rastî çavê min ji eşqan tijî hêstir bûn, min dît ku gelê kurd bi zimanê xwe dixwîne, dinivîsîne û dipeyive. Min got "Êdî ez bimirim jî ne xem e." Bi rastî gelê cîhanê ji sala 7'an dest bi dibistanê dike û jiyana xwe di welatê xwe de derbas dike. Lê em kurd di 70 saliya xwe de dest bi dibistanê dikin

û jiyana xwe jî di welatê xerîbiyê de didomînin ku ev biryar ne me standiye. Ji aliyê neyarê me ve hatiye standin. Ez nabêjim hatiye standin hatibû standin, ji ber ku îro kes nikare vê biryarê bistîne.

Êdî biryara vê rewşê emê bi xwe bistînin û em distînin û qeweta me jî jê re heye; ji ber ku em jî xwedî partî, xwedî artêş, xwedî enî, xwedî meclîs, xwedî televîzyon û xwedî rojname ne. Em xwedî van tiştan e, belê ev tişt wisa bi riheî nehatine holê. Ev tişt bi xwîne hatin holê. Bi hezaran qîz û xort, jin û mêr, zarok û kal hatin şehîdkirin û bi sedan gund, bajar hatin tarûmarkirin. Lê ne xem e, ji ber ku 40 milyon kurd di 15'ê Gelawêjê de ketin emrê 12'an û em hemû xort in temarê dilê me wekî birûska hîva avrêlê lê dixê. Emê rabin bi hêrsa jiyane bi milê şehîdê xwe bigrin û bi hev re govendê bigirin ku biheje erd û asman û biqehire dijminê xwînswar û şad bibê gelê jar. Belê em 12 salî ne, em ji nû

ve ji jiyane re dibêjin merheba. Merheba 15'ê Gelawêjê, merheba jiyana birûmet, merheba sed carî merheba.

### CABBAR BARIŞ

### Di Quranê de mafên mirovan

Quran mezîni dide zanan ku hinek mafên mirovan, bi hatina wan a dinyayê hene. Ji wan ên girîng ev in:

- 1- Mafê jiyane.
- 2- Mafê bawerkirin, azadî û serbestiya wîdan.
- 3- Mafê milkîyetê (mal, gund û welat)
- 4- Mafê hilbijartin û bijirîne.
- 5- Mafê ger û geştê
- 6- Mafê bi cihbûn û hemwelatîyê û hwd.

1- Mafê Jiyane: Berî her tiştî mafê jiyane tê. Ev mafê jiyane ne tenê ji bo însanan e, ji bo hemû

zîruhan e jî. Mafê jiyane û xwe parastinê û jiyana bi serfirazî jî aliyê Yezdanê Dilovan ve hatiye dayîn. Her zîruh wekî însanan ji bo jiyana xwe diperpitin, li tedbîrên xwe parêziyê digirin. Wekî moristanan çawa ji bo rizqê xwe dixebite û xwe li dijî mirovan jî diparêzin.

Mexlûqên ku ji aliyê Yezdanê Dilovan ve hatine xulqandin, tu heqê kesî nîn e ku dawiyê li jiyana wan bîne û bikuje, nikare zirarê jî bide wan. Yezdan çawa ew çêkirine dîsa ew dikare bigire, bikuje. Tu kes nikare mirovên bêsûc û xeta bikuje. Ji ber ku kuştina însanan gunehê herî mezin e. Loma kuştina însanan ji heft xetayên herî mezin e ku mirov bi wê kirinê dibê minafiq û melûn, û pê diçe dogehê (cehenem).

Quranê, kuştina însanan bi neheqî qedexe kiriyê, ên ku bi neheqî însanan dikujin, (wekî dewleta tirkan çawa kurdan dikuje) hetanî dawiyê di dogehê de dişewitin. Wê di ber xezeb,

lenet û cezayê Yezdanê mezin bikevin û ta ebediyê wê di dogehê de binînin.

Dîsa di Qurana pîroz de, di Sûreya Maideyê a-yeta 32'yan de -mealên-kuştina însanekî bi neheqî (wekî tîmên kûçik çawa însanan dikujin) wekî mirov tamamî însanan bikuje, jiyana însanekî her wekî jiyana tamamî însanan e.

Belê, ên ku dibêjin em misliman in, bila li vê a-yetê binêrin. Ka ji kurdan (Partiya Karkeran) û ji tirkan (timê wan, kontrayên wan û hizbî şeytanên wan) kî misliman e? Kî mucahid e, kî zalim e, rezîl e, minafiq e û kafîr e? Îro dewleta tirkan bi qetlîam, zulm û zor û wehşîtiya xwe kurd û Kurdistanê dikuje û dişewitîne. Ji xeynî gundan Lîcê, Pasûr (Qulp), Gumgum (Warto), Êlih û Dêrsim hemû qezayên Dêrsimê şewitandin û hê jî dişewitînin. Zarokên kurdan bi saxî digurênin, tiliyê wan, guhê wan jê dikin; ji xwe re dikin tizbî û pê dilîzin. Ev zilma

hanê, ne Ebû Cehl li Hz. Muhamed û misilmanan, ne Nemrut li Hz. Brahmî Xelîl, ne Fîrewn li Hz. Musa, ne sirpan li boşnakan, ne jî rûsan li çeçenan, ne jî yahûdîyan li filîstîniyan kiriye; incax û incax tirk li kurdan dikin.

Ji xwe re dibêjin misilman. Şoreşgerên kurdan li hemberî vê wehşîtiyê rabûne û însanan (kurdên şoreşger û karkerên tirk jî) ji vê wehşîtiyê xelas dikin, ji bo serfiraziya însanan, ji bo mafên însanan ên Yezdan dane wan ên jiyane ku ji binê lingên zaliman xelas bikin îro şer dikin. Hedîsa Hz. Pêxember jî wiha emir dike. Dibêje "Li dijî zilmê rabin, bibin alîkarê mezlûman (ê zilm lê tê kirin kurd in), şer bikin, hûn nikarin şerkeran bibine malê xwe, bibin alîkarê micahîdan, wê jî nikarin bi qelemên xwe li zaliman neletê bikin, nebin alîkarê wan (zaliman)" Divê ev hedîse li ber çavan bê girtin û li hemberî zaliman şer bê kirin..

**MELE BAGERÎ**



# Ji Welatê Me

ZANA FARQÎNÎ

Gotinek der barê rewşa me kurdan de heye, wiha ye: Heta aqilê kurdan ê paşîn tê, yê pêşîn diçe. Ev, a niha jî rastiyeke me destnîşan dike. Dema ku em dêhna xwe bidin kar û emelên xwe, emê heq bidine vê gotinê.

Di çaxa me de her kes, beriya dest biavêjê karekî, pêşî hîm û bingeha wî amade dike. Ji bo ku kar bêkêmasî û şaşiyên pêk were, çî gerek e dike. Bi kurtî tevdirên xwe dike û tedbîran jî distîne. Lê em kurd hîna li gorî demên berê diçin. Bêyî ku bi awayekî fireh û kûr li ser mijarê rawestin, biramin, hemû mercan bidine ber hev, hilfin û deynin, rokin û bipîvin dest diavêjine kar û em êdî dibêjin "çawa lê hato."

Baş tê zanîn ku avakirina sazî, avahî û rêxistinên, ji bo damezirandina dewletekê gavên pêşîn in. Beriya ku

## Meseleya aqilê pêşîn û paşîn

mirov dewletê ava dike, xwe pêşî bi sazî dike. Di wan saziyan de kadroyan digihîjîne, dihêvoje. Bi vî awayî her sazî di warê xwe de bi pêş dikeve, kêmasiyên xwe rast dike, hewcedarî û pêwistiyên xwe temîn dike. Ji bo rojên pêş xebat û amadehî wiha têne kirin.

Em gava bala xwe didine rewşa saziyên xwe, ev yek welê nameşe. Amadehî li gorî xwestin û hewcetiyê pêk nehatine. Ji aliyekî ve behsa avaki-

rîna dewletê tê kirin, ji hêla din ve jî gazinc têne kirin ku, kadro nîn in. Baş e, dê kî hesabê vê rewşê bide û barê wê hilgire?

Ji bo çî em behsa vê yekê dikin? Lê binêrin, televîzyona kurdî dest bi weşanê kiriye. Ji aliyê ziman ve bi taybetî der barê zaravayê kirdkî (dimilkî) û kurmançî de tengasiyên wê hene. Kesên ku bernameyan çêdikin û pêşkêş dikin, di warê xwe de zehf ne jêhatî û gihîştî

ne. Ev rewş vê bi me dide fikirandin. An kadro nîn in, an jî kesê ku ji wan tê, kar li wan nehatiye spartin.

Carinan ku rexne li kêmasî û şaşiyên tê kirin, bersiv tafilî tê dan: "Hîna em di destpêkê de ne." Belê wisa xuya dibe ku em xwe bi vê rewşê dixapînin jî. Çima? Ji ber ku hin sazî hene ku temenê wan jî pênc-deh salan derbas dibe. Ji bo vê yekê jî em dikarin bibêjin em hîna di destpêkê de ne? Bi ya min na. Heke saziyan ji roja pêşîn girîngiyê bidana gihandina kadroyan û ew bi zimanê kurdî hîn biki-rana, niha em ne di vê rewşê de bûn.

Tevî her tiştî dîsa ne dereng e. A baş ew e ku em li rewşa xwe werqilîn û vê pirêzeya xwe biguhêrin. Divê em li hêviya xeyberiyên nemînin ku werin karên me bikin.

Di gerdûnê de tu tişt ne bi tenê, ne bi serê xwe ye û bi sedemeke bi tenê ve ne girêdahî ye. Heke ku gelş bi sedemeke bi tenê ve girêdahîbûya hem çareserkirina wê hêsan bû û hem jî nedihatî wan qonaxên girîng û di gerdûnê de ewqas mezin nedibûn.

Du awayên kêmasî û xeletiyên hene. 1-Bi vî (îradî) 2-Bêvî (bêhem-dî)

Lê sedemên tu kêmasî û xeletiyê ne bi daxwazê ye îradî jî be. Bingeha vê ramana çewt, zaaf û kêman-zanatî ye. Gava ku em li kêmasiyên di HA-DEP'ê hene, dinêrin di bingehê wê de jî ev tişt hene ku bi sed salan e di rehê gel de hatiye bicih-kirin. Zaaf jî girîngiya wan ji hev cuda ne û li gorî rewşa gelan diguhe-

rin.

Zaafa gelê kurd a me-zin û xuyayî (eşkere):

1-Kariyerîzm. 2-Xwe-serîttî (egoîzm) 3-Bilind-girtina azadiya xwe yê şexsî di ser a neteweyî û civakî re.

Ev tişt jî dîrî kolektî-vîzmê ne. Ku kolektîfî xurt nebe rêxistiniyeke serdet jî çênabe. Lewre di bingehê rêxistiniyê de kolektîfî heye. Ew kesê xwe-diyê van zaafan e, nikare di nav gel de rêxistini-yekxurt çêke. Ji ber ku hêja bi xwe, ji rêxistiniyê qenc fêm nekiriye. Gava ku gel van kêmasiyan di-bîne, girêdana xwe ya rêxistinî qels digire û di serê wî de ramaneke şaş çêdibe.

Heke HADEP bikaribe

rêxistiniyê di nav gel de xurt bike, livbaziye demokratîk zêdetir dibin. Xwendevanên Welatê Me, Ö.Halk û hwd. zêdetir, hêviya gel xurt dibe û gelşên (meseleyên) aborî jî siviktir dibin û xwedî-derketina li nixên nete-veyî û civakî xurtir dibe, her wiha dikare vê rasti-yê bi welatparêzan, de-mokratîk, dilxwazan û hwd. bide fêmkirin. Bi serê xwe, bi tenê jî têko-şîna azadiyê û demokra-siyê re tu feydeyekê nay-ne.

HADEP di van tiştan de ji bo bi ser bikeve, girîng e xwedî endam û karbidestên zana, fêman, polîtîk û rewşenbîr be. Girîngiya rewşenbîran di nav têkoşinê de ji her ke-

sî ve xuya ye. Lewre di nav têkoşinê de welat-perêzî û duristî bi tenê ne bes e, jî bo endamî û kar-bidestiyê. Astengiyên barê têkoşinê wekî pest û êrîşên dijmin gayrî îra-deya partiyê ne, lê tevî-nebûna rewşenbîran a nav refên têkoşinê ne wi-san e. Xebateke rast û xurt dikare wan tevî têko-şinê bike.

Rewşenbîr ji bo çî tevî têkoşinê nabin? Hin rew-şenbîr ji ber astengiyên xwe yên siyasî, huqûqî û hwd. nakevin nava têko-şinê. Hin rewşenbîr jî, ji ber henek kêmasî û tevî-heviyên ne di cih de, dîr disekin. Hinek rewşenbîr jî, ji aliyê dijmin ve bi hi-nek awayan têne rawes-tandin. Mîna kuştin, gir-

tin, sirgûn û hwd.

Di bingehê fêm nekiri-na HADEP'ê û tîrsa li ser gel de jî kêmasiyên rêxis-tinî hene. Ew tîrsa li ser gel, ne hemû tîrsa bi sed salan e. Hinek jî tîrsa bêhêvîttî û bêrêxistiniyê ye.

Gava HADEP van kêmasiyên xwe yên vîni (îradî) ji holê rake, êdî ne kêmasiyên siruştî û ne jî dijwariyên dijmin nikare ji pêşketinan re bibe as-teng. Wê gavê gelş herî girîng gelş aborî (eko-nomîk) jî, ji holê radibe. Ji bo ku kêmasî ji holê ra-bin pêwîst e hemû rew-şenbîr û zana, xwedî tec-rûbe, ramyar, demokrat û weltparêz hewl bidine xwe. Daxwaz jî ew e ku her kes li gorî hêza xwe cehd bike û bixebite..

SEYFETTİN ÖZCAN

## Gelşên pêvajoyê û rewşa HADEP'ê

### FERHENGOK

**Aşîp:** Şepe, aşît, aşût; ji berfa digindire re tê gotin  
**Aşop:** Nigaş, xeyal  
**Bergeş:** Sifreya xwarinê  
**Bingeh:** Binyat, hîm, xîm  
**Dad:** Edalet  
**Dadgeh:** Mehkeme  
**Dadger:** Hakim  
**Dadgerî:** Muhakeme, mehkemekirin  
**Dadmend:** Adil, kesê ku bi edaletê ve girêdayî ye û diparêze  
**Dadperwer:** Kesê ku ji edaletê hez dike  
**Fêrmisk:** Rondik, hêstirên çavan  
**Kawik:** Ji mirovê saf û dilpak re tê gotin  
**Keşxe:** Xortê lihevhatî  
**Leyan:** Pêlava berfê, ji 'ski' re jî tê gotin  
**Lîlav:** Ava berfê  
**Mamiz:** Ahû, xezal  
**Palûte:** Alîkariya gel ya bi hev re

**Parêzgeh:** Wîlayet, bajar, şar  
**Parêzger:** Walî, serokşar  
**Parêzer:** Ebûqat  
**Renî:** Lehiya berfa têrav; aşîta berfa nîvheliyayî  
**Sergeh:** Tawan  
**Şepal:** Cinsekî pilingan e, panter; her wisa ji mirovê jêhatî re jî tê gotin  
**Şevder:** Misafir, kesê ku li derveyî bineciha xwe, şeva xwe derbas dike  
**Şevnişîn:** Devera ku bi şevê mirov lê dadide. (Gece kondu)  
**Şexxwer:** Debançe, demançeya ku şex guleyan dixwe  
**Torîn:** Lihevhatî; ji bo keçan tê gotin  
**Veman:** Bi derengahî ketin, bi paş de man (gecikme)  
**Vehêlan:** Vehîştin, terikandin  
**Win:** Meçhûl, nediyar  
**Yad:** Bîranîn, xatira  
**Zerî:** Keç; ji keça ciwan, jêhatî û zana re jî tê gotin

### AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

<input type="checkbox"/>	6 Meh	<input type="checkbox"/>	1.000.000 TL	<input type="checkbox"/>	80 DM
<input type="checkbox"/>	12 Meh	<input type="checkbox"/>	1.800.000 TL	<input type="checkbox"/>	150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

**NAV û PAŞNAV** : .....  
**NAVNIŞAN** : .....

**Navnişana Welatê Me**  
 Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
 Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

### WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
 (Haftalık Gazete)

Li ser navê  
 ROZA Basın ve Yayıncılık  
 San. Tic. Ltd. Şti. adına  
 Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê  
 (Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ  
 Aynur BOZKURT  
 Sami TAN  
 Suut KILIÇ

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
 (Yazışleri Müdürü)

Metin AKSOY

NAVNIŞAN (Adres)  
 Ayhan Işık Sok. No:23/3  
 Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
 293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE  
 Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ  
 (Temsilcilikler)  
 Çukurova- Salihî Kevirbirî  
 322-3597930  
 Suriye- Jan Dost  
 Fener Rojbiyanî

Berlin- Silêman Sido  
 Sîrwan Reşîd  
 49-30-69002695  
 Hannover- Selîm Biçûk  
 49-5721-81360  
 Hamburg- A.Hekim Gülsün  
 49-40-403388

Munchen- Mahmut Gergerî  
 49-871-670884  
 Badenwurttemberg-  
 A. Rahîm Ayaz  
 49-75453258

Amsterdam- Cotyar Xaxoy  
 31-20-6130766

Paris- M.S. Ayçiçek  
 33-1-48000401


Atina- Ferhan Zêbarî  
 30-13634905

Bruksel- Medenî Ferho  
 32-16-490767  
 Stockholm-  
 Robîn Rewşen  
 46-8-7510564




Birayê Alaattin Kanat, Ahmet Kanat bang li malbatên îtirafkaran kir û got:

# 'Werin em vî navî ji ser xwe rakin'



Ahmet Kanat



Alaattin Kanat

## Kurtejiyana Alaattin Kanat

Di sala 1962'an de li bajarê Amûda Başûrê Biçûk (Sûrî) tê dinê. Malbata Kanat bi xwe ji Bakur e û ji navçeya Mehsertê ya Mêrdînê ye. Beriya ji dayikbûna A. Kanat, malbata wî derbasî Başûrê Biçûk dibin. A. Kanat li wê derê tê dinê. Piştî 2 salan malbata Kanat dîsa vedigere Bakur. Alaattin Kanat di salên 1970'an de di heşt saliya xwe de têkoşinê nas dike. Pêşî xebatên xwe di PDK'a Tirkîyeyê de didomîne. Naskirina PKK'ê, di sala 1985'an de dest pê dike. Ji sala 1985'an heta sala 1990'î li gelek bajarên Kurdistanê, metropolên Tirkîyeyê û li Rojhilata Navîn têkoşina xwe didomîne. Di sala 1990'î de piştî girtina xwe ya li Stenbolê, dibe îtirafkar. Navê Alaattin Kanat di kuştina Mûsa Anter û Mehmet Sincar de derbas dibe.

**D**i dema berxwedanên ji bo aşî, serbestî û serxwebûnê de, ku bi serkêşiya girtiyên PKK'î li dar ketibûn, malbata îtirafkar Alaattin Kanat jî beşdar bûbûn. Berpîrsê me yê Çukurovayê, bi kekê wî re hevpeyvînek pêk anî. Em wê ji ber ku dê bala we bikişîne diwêşînin.

**Birêz Ahmet, beriya îtirafkariya Alaattin Kanat, gelo pest û kotekiyên hêzên dewletê li ser we hebûn?**

— Belê hebûn. Beriya îtirafkariya wî, dema ku di nava doza PKK'ê de bû, gelek caran malbata me, bi giranî jî ez û bavê xwe bi mehan di bin îşkençeyên giran de li heps û zîndanên Amed û Meletiyê man. Ji sedemên van yekan jî em hem ji aliyê madî û hem jî, ji aliyê manevî ve ketin. Êrîşeke wisa li ser malbata me hebû ku, me nizanibû em bi ku derê ve herin. Tim jî me Alaattin dixwestin û digotin: "Divê hûn wî teslîmî dewletê bikin." Lê tu car me gav bi paş ve neavêtin. Me bedena xwe ji êrîşan re dikir hedef, lê me teslîmiyet qebûl nedikir.

**Îtirafkariya birayê we, li ser malbata we tesîrekê çawa kir? Û berî îtirafkariya wî nêrîna gelê kurd, li ser we û malbata we, wê demê çawa bû, îro çawa ye?**

— Dema me ev yek bihist, dinya li me tarî bû. Bi mehan ji qehran gepek nan û dilopek av di qirika me re nedîçû. Bi rojan em jî mal derneketin. Ji ber rewşa xerab û dijwar, em gelek li ber xwe diketin. Di nav malbata me de bêhuzûrî dest pê kir. Endamên malbata me piştî vê bûyerê jî aliyê psîkolo-


jîk û fizîkî ve ketin rewşeke reş û tarî. Bavê min Mustafa îro ku ji çavên xwe seqet e û ji aliyê teqata xwe ve kême, sedemên van yekan ev e.

Beriya ku Alaattin bibe îtirafkar, ji ber ku navê General Zinar bi nav û deng bû, gelê kurd bi awayekî xweş û baş li me dinêrî. Dema yekî ji yekî re bigota: "Ev birayê, an jî ev xwişka General Zinar e" malbata me datanîn ser serê xwe. Rûmeteke

naryoyê, tehemûl û taqeta me ji vê yekê re nema û li her deverî me ev îxaneta ku bi gelê me yê bindest re hatiye kirin, lanet kir.

Lê îro tîkiliyên gelê kurd û malbata me bi lezeke xurt bi aliyê başiyê ve diçe. Gelê me li ku derê be, ez û malbata xwe heta dawiyê û heta mirinê li cem wan in. Ji ber vê yekê jî, îro hûn dibînin ku ez û malbata xwe ji bo piştigirî û alîkariya berxwedana ji bo aştiyê ketine

bibînin. Wê çaxê wê gelê me wan malbatan jî wekî min hambêz bike. Bila qet ji bîr nekin ku şefqet û rehma gelê kurd ji şefqet û rehma dewleta xwînwar qat bi qat zêde ye û birûmet e. Ez bi vê mebestê, bi riya rojnameya Welatê Me bang li hemû kurdan dikim, çî cerdevan, çî îtirafkar, çî ajan û sîxur çî kurdan xafil, bila werin ji nav refên kewên gozel ku hev dixin nav qaf û dafan, derkevin bi-



Ahmet Kanat tevî pîrek û xwişka xwe tê dîtin.

giranbuha didane me. Şev û roj gelê me dixwest ku em bibin mewanên wan. Ev yek jî, ji me re dibû şahiyê mezin û rûmetekê xurt.

Piştî rewşa Alaattin, dema ku dirêj tîkiliyên malbata me û gelê kurd gelek qels bûn. Ev rewş hatibû merhaleyê wisa ku, êdî kesekî silava Xwedê jî li me nedikir. Ji ber vê yekê em pir li ber xwe diketin. Lê ji ber ku her kes jî xwe berpîrs e, me bang kir û got: "Alaattin Kanat bi gelê xwe leyîstiyê, em nabin leyîstikvanên vê se-

greva birçibûnê. Ev jî dibê şikandina nêrîna gelê kurd ku 3-4 sal e, li ser me didome. Hevalbendên ku îro di birçibûnê de ne, bavê Serokê Konseya Birêveber a PKDW'ê Zübeyr Aydar, Mele Evdile Aydar jî di nav de ji ber vê yekê malbata me pîroz kirin. Ev jî, ji bo malbata me dibe rûpeleke nû û paqij.

Em dixwazin ku ew malbatên ku mirovên wan bûne îtirafkar, ji bo vê demxeya qirêj û gemar ji ser xwe biavêjin, werin vê eleqe û şefqeta gelê me

Kevin nav refên gelê me yên ku ji bo namûs, şeref û azadiyê li ber xwe didin.

**Beriya demeke kurt, we ji bo çapemenî û gelê kurd daxuyanîyek kir. Di daxuyaniya xwe de we gotibû ku divê Alaattin paşnavê Kanat biguherîne, ji ber çî?..**

— Ji bo vê yekê em dikarin bibêjin ku, em dereng jî mane. Lê sedemên van yekan jî hebûn. Êdî tehemûliya me ji vî tiştî re nemabû. Em naxwazin ji îro û pê ve Alaattin Kanat bi qasî misqalekê be jî bi-

be şîrikê navê malbata me. Bila Elo (Alaattin) bizanibe ku, tu qedr û qîmeta wan ne li nav malbata wan, ne li nav gelê wan û ne jî li nav ew kesên ku vê gavê di nav wan de heye. Ew kes rojekê wê ji gelê kurd şimaqên wiha bixwin ku, sosretên wiha nehatine dîtin. Ji xeynî vê jî wê rojek were ew şexsiyetên ku bi kêrî gelê xwe nehatine, wê werin dîtin ku bi kêrî gelên din jî nayên, wê çaxê ew îxanetên wan wê serê wan bixwe. Di serhildana Şêx Seîd û Seyîd Riza de xayintiya di nav kurdan de ku dawiyê hatiye cezakirin, hîn jî zindîya xwe di mejiyan de winda nekiriye. Dawiya Eledîno û yên wekî wan jî wê wiha be...

**Ji bilî we, ji malbata we îro em dibînin ku pîreka we Yildız û xwişka we Mehdiye jî, ji bo berxwedanê ketine greva birçibûnê. Di nêrîna we û yên wan de tu cudabûn heye?**

— Di nav me de tu cudabûnî û dubendî tune ye. Ez çî dibêjim û çî difikirim ew jî wiha dibînin û difikirin. Ew jî, birayekî wekî Alaattin qebûl nakin. Ew jî wekî me tevan nehlet li îxaneta ku li dijî gelê kurd qewimiye dibînin. Ji bilî me bavê me jî, ji roja berê heta îro dibêje: "Kurekî min î wiha tune ye, nehlet lê were."

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

